

Ömer Dilsöz

- şiirler -

Yayın Tarihi:

27.9.2004

Yayınlayan:

Antoloji.Com Kültür ve Sanat

Yayın Hakkı Notu: Bu e-kitapta yer alan şiirlerin tüm yayın hakları şairin kendisine ve / veya yasal temsilcilerine aittir. Şiirlerin kopyalanması gerçek veya elektronik ortamlarda yayınlanması, dağıtılması Türkiye Cumhuriyeti yasaları ve uluslararası yasalarla korunmaktadır ve telif hakları temsilcisinin önceden yazılı iznini gerektirir. Bu doküman, şairin kendisi veya temsil hakkı verdiği kişinin isteği üzerine Antoloji.Com tarafından, şairin veya temsilcisinin beyanları doğrultusunda yayınlanmıştır. Bu dokümanın yayınlanması kullanılması dağıtılması kopyalanması ile ilgili husularda ve şiir içerikleri ile ilgili anlaşmazlıklarda Antoloji.Com hiç bir şekilde sorumlu ve taraf değildir.

Ömer Dilsöz (04.12.1978)

Omer Dilsoz 1978 yılında Hakkari'nin Güzeresh köyünde dünyaya geldi. Liseyi Hakkari İmam Hatip Lisesinde okuyan Dilsoz'un 'Hêviyên Birîndar' yani 'Yaralı Umudlar' adında 2003'te yayımlanmış bir anı-romanı var. Azadiya Welat gazetesi ve bir çok dergide deneme, öykü ve şiiri yayımlandı. Omer için yaşamdaki en büyük gaye, yaşanılır bir dünyada bütün din, dil, ırk ve renklerin eşit, adil ve beraber yaşayabilmesi ve birbirini anlayabileceği bir dünyada yaşayabilmesi...

Eserleri:

Roman: Hêviyên Birîndar. 164 sayfa. Aram yayınları

Adını bile anmayacağım

sana gelecektim
son kararımı vermiştim
sana her şeyi söyleyecektim
hatta 'çam sakızı çoban armağanı'
bir hediye bile alacaktım
ama nereden bilecektim
senin sessizce gideceğini
veda bile etmeden...

uğurlar olsun,
adını bile anmak istemiyorum
.....X

Ömer Dilsöz

Avedana hestên herîşî

Hestên min gelek herîşî ne; bêgav im. Di mejiyê min de bi hezaran pirs tîn û diçin. (...?) Dilê min kovandar e, şikestî ye; hizrên min şêlû ne. Ditirsim ji her tiştî; ji her kîte kîte... Ji dengên xwezayê; qîrîn, qîjîn û qorînan... Ditirsim ji hêviyên xwe. Newêrim wan birêsim û newêrim xeyalên xwe raçînim. Dilê min şikestî ye û hêviyên min birîndar in...

Roj diqulipin. Dem diherike; saet, roj, meh û sal dikudin... Dem zora her tiştî dibe û demildest diçe û bi xwe re dibe her tiştî... Hêj wekî duhî bû dema ku min jiyana nasî û wate li heyîyan barkirî. Bes, hemû jî çûn; yek bi yek, dû hev û ji nişkê ve li pêş çavên min berze bûn; yaren, destbira, birader, hevrê û heval... Dûr û nêz, nas û biyanî... Çû, çûn hemû jî bê seroşûn; tenê bîrhatinên wan mane tomarkirî di birka jêrhişê min de...

Ne min gotibû, hestên min gelek herîşî ne vê berêvarê. Vê berêvara ku roj li ser gopikê bilind hêdî hêdî tîna xwe dişkêne û amadehiya xatirxwestinê dike. Tu dizanî, ez qet ji peyvên xatirxwestinê hez nakim, bes! ... Rojeke xweş e îro; hewa hêdî hêdî germ dibe, dihele berfa stûr a ku çiya û newal tev nixumandibûn û wergêrabûne ser rengê spî...

Xweza vedijî; kulîlkên yekem ên biharê 'berfîn û canemerg' rûyê berfê dikelêşin û silav didin biharê. Bes, dilê min gelek westiyayî ye. Hestên min herîşî ne. Gelek bi tenê me; çavê min dipê her liv û lebata xwezayê. Pêjnek di nava min de dibêje min: 'Îcar nebû, dê careke din...' Û li wir dixetîme verêja gotinê. Êdî, nema tê bawerîya min bi jiyana. Jiyana gelek sar tê pêş bergeha dîtbarîya min. Şêlû dibîne êdî hemû hizrên min. Şêlû dibîne jiyana û tiştên ku jiyana ditamijînin...

Hingê ji nav birka bîrhatingeha min hiltavêje dilopeke hêviyê û li pêş çavên min çirûskê dibiriske; leylan dide li ser deryaya xeyalên min ên ku di niv rê re hatine fetisandin. Hingê jî ez diçim ber bi hestên xwe yên herîşî ve û dikevim nava deryaya kul û xem û kovanan. Wê gavê, rondikeke dizok ji birka çavê min hiltavêje û dikeve ser sûretê min û tê de digindire hêdî hêdî... Wê gavê ez di cihê xwe de radiwestim û berê xwe bi aliyê çiya ve dizivirînim. Jixwe, kengî ez ketibim di nava herîşîneke wisa de min her weha kiriye û welê diyar e ku dîsa li vir dubare dibe helwesta min a jixwewerînê... Direvim ber bi cihekî nediyar ve.

Çiya li benda min in. Ew li benda bihareke rengîn in. Ew li benda vejîneke din in. Dîsa 'bi xêr tê' tê û li benda gelek hêviyan e; ew, ji bo hêviyan vedijî û digirniye careke din li gel hestên min ên herîşiyayî. Gazî min dike bihar, dibêje; 'Were, xwe berde hundirê delaliya min.' Bes, ez ji wê dûrdikevim, ew jî ji min... Nizanim ji ber çî, lê herçend nêzî wî dengî dibim, berevajiyê di heman katê de jê dûrdikevim jî. Ango, nêzîkiyeke dûr, dûrahiyeke nêzîk. Berevajî dibe her tişt di nava bawesîska hizrên min de. Ditirsim, ditirsim! ...

Hingê, careke din tê bîra min çend tişt; çend bîranînên daborîn û çend kovanên li ser mêlaka min bûne jan û têperiyane. Ez ditirsim ji xewn û xeyalên xwe, ji dilê xwe, ji mejiyê xwe, ji hêviyên xwe. Herwekî 'marî geztibim, wişî ji werîs ditirsim.' Dibe sehm her tiştê heyî; heyî dibin tirs û dikevin nav jiyana min. Û bihar tê bîra min. Bihera welatekî rengîn. Rengên kulîlkên cuda cuda yên wî welatê tîn pêş çavên min. Sor, mor, binevşî, zer, kesk, spî û peyazî... Her regek şûna ku 'hêviyê' di min de vejîne, berevajiyê dukuje. Hingê, reng wateya xwe li nav jiyana min winda dikin.

Ne vê berêvarê hestên min gelek herîşî ne. Dilê min bûye kozgeha xem û xeyalan. Ditirsim. Gelek tişt tîn bîra min; duh û îro, pêr û sibê. Di navbera çarçûveke teng de tîn û diçim. Dilê min li ber lehiya şikesteyan dike ku bimîne. Ango, hestên min di şerê

man û nemanê de ne. Mejiyê min ji mêj ve têkçûyî ye. Êdî ew nema dikare gewdeyê min ê westiyayî rabigire...

Gelek bêgavim. Divê hestên xwe vejînim. Divê xem û kovanên xwe bikim cûnî û biqutim. Divê êş û janên xwe deynim bin destarekê û bihêrim da ku careke din dest pê bike jiyan. Da ku xweş û geş bibe cîhan. Da ku bitamije evîn û hebûn. Da ku -bi kurtebêjî- dîsa wate li heyîyan bar bibe û biherike ava jiyanê li dêmistana dil û mejiyê min. Lewma careke din berê xwe didim çiya; welatê kûvî, li nav xwezaya rengîn...

Gelo çî ye çiya hin jêneger dike ji bo me? Gelo ji ber çî çiya me bi jiyanê ve girê dide? Çî ye raza çiya? Çî ye vîna çiya? Çî ye tama çiya? Ji bo çî ew der hertim dibe cihê destpêkan? Ew der dibe kozgeha hêviyan? Hêlîna xweziyan? Ma jiyana çiya çawa ye?

Vê berêvarê ez vê pirsê ji xwe dikim. Dûvre jî berê xwe didim çiya. Xeyalên min li wir in; di dilê çiyân de. Li nik heval û hogiran. Li nik şervanên azadiyê. Li nik gerîla. Mirovên jiyanhez. Mirovên mirovhez. Mirozên azadîxwaz. Mirovên dilêr û evîndar. Mirovên bi rastiya tama jiyanê hesiyane. Mirovên jiyanê. Gelo çî ye wan hin bi jiyanê ve, bi jiyana çiya ve girê dide? Gelo qey bilindahiya çiyân e? An ne ku hêşinahiya çiyân e? Çiya navê ditir ê afrîneriyê ne. Çiya warê avakirinê ne. Çiya kozgehên mirovahiyê ne. Çima?

Tu dizanî, li wir; sal pênc demsal e. Çar demsalên xwezayî ne, ya din jî di nava demsalan de afrîneriya demsaleke nû ye. Ku ew jî gerîlatî ye. Pêşmergetî ye. Û mirov li wir di nav werzan de werzeke zêde dijî. Ew der warên paqij û bijûn in; negihîştîyê destên mirovên çavbirçî. Li bilindahiya lîsên çiya, li dora mêrg û keviyan, di nav şkêr û zinarên asê de, di bin dilopên şikefteke kevnar de, li gel dengên xwezayê yên cuda cuda, yên biefsun; sîsirk û wawikan derbaskirina şevexwînên dirêj û bisaw. Gelo çî ye wan li wir bi jiyanê ve girê dide?

Bêguman bîranînên şehîdan. Şehîd dilê dîrokê ne. Şehîd giyanê dozê ne. Şehîd rastiya jiyana serfiraz in. Şehîd doz in, doz şehîd... Şehîd azadî ne, şehîd çiya ne, çiya şehîd... Li her bihosteke van çiyân xwîna şehîdeke hêj nenavkirî heye. Ev çiya bi xwîna wan ciwanên hêj di bihara umrê xwe de bûne şahîda/ê hêrsa dilê mirovên vî welatî, hatiye avdan. Herdîsa dê bi xwîna wan jî were avedankirin...

Êdî li vir diwestin hestên min ên herişî. Gotin dimiçiqin. Peyv bêdeng dimînin û ez dikevim rîyeke dirêj. Bihar li ber vejîne ye. Kulîlkên yekem ên biharê 'berfîn û canemêrg' di hewla pişkdayîne de ne. Zîlên xwe avêtine. Berf dihele. Hewa germ dibe û jîngeh hêdî hêdî kirasê keskahiyê lixwe dike. Herwiha ez jî hêdî hêdî dimeşim ber bi çiyayê roj lê ava dibe.

2002/ Culemêrg

Ömer Dilsöz

Axîna min

stranên min
wekî hilmeke sar ji ser zimanê min ditehisin
û di nava bêdengiyê de winda dibin
jan dikeve dilê min
janeke gelek tûj
ruhê min dicemide
digerise...
zîhna min dikeve ber pêlên ramanên kevn
hingê şewateke giran bi dilê min dikeve
diêşe
diêşe
diêşe
dawayê ez û êş dibin parçeyekî ji hev
wekî goşt û neynûkê...
her ku jiyan bi rikberî li nav rehên min digere
êş jî mezin dibin
êş jî giran dibin
mîna lehiyekê
bi ser xewnên min de tî xwarê
bi ser xeyalên min de tî xwarê
bi ser xweziyên min de tî xwarê
bêhna min diçike êdî
dimirim
na na
roj bi roj dihelim
çeng bi çeng
dilop bi dilop
wekî berfa tavê lêdayî
dihelim û dihelim
lê ava ji min diherike
dikeve nav dilê axê
tê dipere
û tê de dibe jiyaneke nû
vedigeşe
vedijî

û ez dibim kulîlkeke lawaz
canemerg yanî:
li biyabanan
li beyaran şîn tîm
umrê min pîr kurt e
û pelên min pîr tenik in
ne dikarim li ber baranê
ne li ber gijlokê
ne jî li ber bayekî xurt ber xwe bidim
zû dibehim
zû diçilmisim
û pûç dibim
lê tu kesî hay ji min nîn e

.....
.....X

4. Rezber.2004\ Amed

Ömer Dilsöz

Bakma bana

Gözlerinden okuyorum
yaşamın bütün yalnızlıklarını
acıyı görüyorum
yaşanmamış özlemleri
yalnızlığın çığlıkları kulak zarımı patlatıyor
gözyaşların süzülürken yanaklarından

Sende kendimi görüyorum;
kendimden yaralı bir parçayı
zihnimde halen cevapsız sorular
damla damla kanıyor içime
soğuk bir gözyaşının desteği yarayı
içimde yaşıyorum...

Hayır,
bakamayacağım gidişine
dayanamam bu kadar acıya
bu kadar yalnızlığı kaldıramaz yüreğim
bedenim titriyor bak
tutmuyor el ve ayaklarım
yıkılıyorum işte yaralı bir aslan gibi

Lütfen bakma bana öyle yaralı yaralı
zihnimde dünyalar yıkılıyor
sanki yüreğimden birşeyler kopuyor
içimdeki umut kıvılcımları
birer birer sönüyor

Gözlerinden yalnızlıkları okuyorum
korkular bir kangren gibi dağılmış içine
içimden birşeyleri öldürüyor
sen ağlayınca yüreğim kanıyor

01.Eylül.2004 \Diyarbakir

Ömer Dilsöz

Belav bû pergala min

Har bûne hestên min ên serberdayî
Li sînga min dikutin
Wekî masiyekî ku hewl dide xwe ji tûrê bavêje der
Lê li hizrên min dialiqin
Dest pê dike hingê lêkdaneke bêmefer

Ruhê min giran dibe li ser bedena min
Ling difelişin
Dest dilerizin
Beden xav dibe
Hildikişe rajena min

Sar bûne xweziyên min ên derengmayî
Li dilê min diçilmisin
Wekî kulîlkeke bêhnxweş a lêser hatiye ser
Lê li hêviyan hevrû dibin
Dest pê dike hingê jixwewevineke bêveger

Dilê min bê war dimîne li nav qefesa sînga min
Dicemidim
Ditirsim
Rondik têne xwarê
Belav dibe pergala min

2004-09-27/ Amed

Ömer Dilsöz

Ben biraz daha ağlıyacağım

anlıyor musun?

ben biraz daha ağlıyacağım.....

lülfen...!

lülfen gözlerini çek oradan...

geçme karşıma... gülme... gülümseme...

seni görmemeliyim....

birak beni...

ben acınacak durumda değilim ki....

hayır... sevgi dilemiyorum kimseden...

hele senden...asla!

-neyse-

bak güneş yine karanlığa bırakıyor bu şehri...

ben karanlıkları çok severim aslında...

hele bu şehrin karanlık geceleri...

bir başka olur inan...hele sensizken...

aslında ben seni hayallerde daha seviyorum...

çünkü orada hiç yoktur kaybetme ihtimali...

sen hep benimsin...

yalnızca benim...

-ama-

oysa gerçekte...hiç benim olmadın...

bir kez bile öpmedim seni... tutmadım ellerini...

ve hiç söyleyemedim sana 'o beni içten yakan...

sarsan... o en ürktüğüm...ama en sevdiğim kelimeyi'

anlamadın mı?

-seni ne kakar sevdiğimi- yani 'çılıncıca seviyorum seni'

-neyse-

biraz daha ağlamak istiyorum....

ben ağlarken her şeyi unutuyorum...

içimdeki o birikmiş

'o kimseye açamadığım dertlerim' sanki biraz hafifliyor...

ağlayınca ben... seni nasıl sevdiğimin günahını....

sana nasıl tutulduğumun sızısı yüreğime iner sanki...

senden kaçmak...

senden kaçıp yalnızca hayallerime gömülmek istiyorum...

çünkü olmuyor... dayanamıyorum... hep uzaklardan..

başkasıyla kolkola gezerken...

başkasıyla yaşadığın maceralarını dinlerken...

içime bir öfke...

bir acı iner....

-çünkü bir çocuk kadar saf sevdim seni-

Lülfen...

Allah aşkına yaklaşma bana...

ben yalnız kalmak istiyorum

ve biraz daha ağlamak...

çünkü ben hep 'ihtimallerle' hep belkilerle seni hatırlamaktan...

senin hayallerini kurmaktan yorgun düştüm artık...

-bırak beni ya-
bırak da biraz daha ağlayayım....
çünkü ağlayınca ben kendime geliyorum...
seviyorum...
senden uzaklaşıyorum...
kendimden geçiyorum çünkü...
bırak beni...
-ben biraz daha ağlayacağım-

Ömer Dilsöz

Bilmem ki

Bilmem ki
yüregimin hangi kuytu köşesinde arasam...
hangi yalnızlıklarda
hangi seherin gelmeyecek umutlarında
bilmem
hangi sessizliğe sorsam O'nu
hangi yaradan kanar ki,
hangi?

Bilmem kimin gözyaşlarında
şimdi usulca damlamakta
kimin dualarında süzölmekte
vuslatı hangi mevsime devreder
hangi yalnızlıkta,
hangi?

nerede arasam O'nu
unutulmuş hangi mabedte
terkedilmiş hangi sevdada
yarı-kalmış hangi ibadatte
nerede arasam ki,
nerede?

Hangi yol gider O'na
nerededir ki O
hangi sessizlikte gizlenmiş
yüregim görmez oldu O'nu
kime sorsam ki,
kime?

Ömer Dilsöz

Çavxezal

Çavxezal,
Şebra dilê min çi bêjim
Rojê tîna xwe ji dest daye
Ewr ketine dorê
Şêr birîndar ketiye
Çeqel digerin li derdorê

Çavxezal,
Şebra dilê min çi bêjim
Ma nabînî her tişt vajî bûye
Her tişt şêlû bûye
Ma dê bo kê bêjin derdê xwe
Dost û dijmin ne belî ye

Çavxezal,
Şebra dilê min çi bêjim
Ji destê qederê ruh birîndar
Ji destê te dil birîndar
Ji destê hevalan beden birîndar
Ji destê te jiyan'im birîndar

Çavxezal,
Şebra dilê min çi bêjim
Li hemberî te peyv'im stûxwar
Ji te dûriyê keserên har
Dost'im nediyar, dijmin'im nediyar
Li ser rûyê min du rondikên sar

Çavxezal,
Şebra dilê min çi bêjim
Ji kîjan gotinê dest pê bikim
Bawer bike tama wan jî nemaye
Ji kîjan janê behs bikim
Bawer bike êşa wan jî nemaye

Çavxezal,
Şebra dilê min çi bêjim
Li nav çavên te binêrim bi saetan
Û bêdeng te temaşe bikim
Bipêrîm te de hemû heyam û wextan
Û yekalî ji te hez bikim.

2004-06-07/Diyarbakir

Ömer Dilsöz

Çiya li çiyân dinêrin

Nameya min ji çiyân re. Ji bêhna axê, ji dengê avê, ji tîna rojê re... Nameya min ji evîndara min re. Ji gula çiyân re. Ji stêrka berbangê re. Ji ava ber keviyan re. Ji axa ku ew girtiye nava xwe re. Ji axa ku bêhna wê jê difûre re. Ji wan kulîlkên li ser girê axê şînatî re... Ji wê re... Ji çî tiştê ku bêhna wê, tîna wê, pêjna wê jê tê re! ... Ji dilê min re; ji dildara min re...

Çiya bilind in û li çiyân dinêrin.
Qontêra çiyân tev bi zinar û şîkêrin
Danê sibehan heta danê êvarî
Min çav bi rêka te ve kor kirin

Çiya li hev dinêrin. Ew bi heybet in. Bi sehm in. Bi deng; deng ji çiyân tê; dengên hezar salan. Dengê hezar celebê jîndaran. Dengê jiyânê, dengê mirinê û dengê xweziyan ji çiyân tê. Dengê azadî û serbestiyê. Dengê mîletan ji çiyân tê. Dengê te ji çiyân tê...

Çiya li çiyân difikirin
Rondikên min tîna û qet xwe nagirin
Heke tu dûr bî, ez ji te dûrtir im
Heke tu xerîb bî, ez ji te xerîbtir im.

Çiya tu digirtî nava xwe; tu cezb kiribûyî û tu bi xwe re dibirî. Çiyân gotinên te ji te dizîbûn. Dilê te bi xwe ve girêdayî bû. Tu ji min dûr dixistî; çiya hesûd bû. Li ser evîna xwe dilerizî. Ji bo evîna xwe har dibû. Wê evîn tenê ji xwe re diviya; çiya çavnebar bû li hemberî hezkirina min a ji bo te. Çiyân tu ji min dizî û tu bi xwe ve girêdayî. Wê rojê min radibîst ku tiştêk bi te hatiye.

Gotinên te sist bûn wê rojê,
Keneke tîrş li ser rûyê te niştibû
Awirên te pir sar dinihêrtin
Hişkebayên payîzî ji peyvên te dihatin
Tu li ser çûyîna bûyî
Li ser rîya oxireke nediyar

Erê, ezê vê nameya xwe ji çiyân re binivîsim. Ji bo çiya darêsim gotinên xwe. Bila peyvên min ji çiyân re biherikin. Ezê çiyân bînim ser gotinê û ezê bo çiyân bigerînim zêmarê û ji bo çiyân lidarxînim govendê, semahê... Ezê ji bo çiyân xeml û rapêça zavatiyê li xwe bipêçim û ezê ji bo çiya evîna bihewînim di nava dilê xwe de...

Çiya bilind in ez te nabînim
Teyr û tilûr li ser zinaran datînin
Kew û kewderî li hindav dixwînin
Nêçîrvan dewsê li dû xezalan digerînin

Çiya bi derd in; derdê wan giran e. Derdê çiyân deştên pahn in, geliyên kûr in, avên sar in. Çiya dinalin. Çiya bêhalin... Derdê çiyân viyan e. Ew bi viyanê hene; bi viyanê ser xwe ne. Çiya bêviyan tune ne, mirî ne.

Çiya bilind in mijê baldayê
Keviyên berfê rêz girêdayê
Dilê malwêran ketiye derdê evîna
Dinale heçko dûpişkan pê vedayê

Çiyan tu vexwarî. Tu bûye çiya û di nava çiyan de berze bûyî. Wê rojê min dizanî ku tuyê ber bi wî dengî ve biçî. Wî dengê berz ê ji çiyan dihat. Lê min qet ji wî dengî hez nekiribû; mîna velerzekê di hişê min de diteqiya. Tezing dida laşê min. Ez digevizîm; nexasim wê kêliya min li nav çavên te nihêrt her tiştî tê de xwe dida der. Tu li ser çûyînê bûyî. Tîna çavên te ne ez lê ew dixwest; ew, ango çiya... Lewma hingê qirpînek ji dilê min çû, xwîdanê ez pêçam, tayeke sar xwe berî dilê min da û hema demildest cihê xwe ji tayeke germ re guhast... Ji ber ku min wînda dikişî; tu diçûyî.

Wê rojê rûyê te guherîbû
Awirên te sist dinêrtin
Keniya ser lêvên te tal bû
Gotinên te her tişt vedigotin

Çiya li ber hev rawestiyane. Tu dibêjî qet li benda kesekê ne; jivana wan heye qey! Erê, niha çiya careke din ketine bêdengiyê; careke din ew biserketin; ji ber ku wan tu ji min standî. Ew bi evîna te ve man. Ew bi evîna te ve vejîyan. Qey kulîlkên wê bê tov mabûn? Qey axa wê bê xwîn mabû..? Lewra wisa har bûbû... Erê, min radibihîst ku ew harbûn ne harbûna xêrê bû. Wan evîna min ji min dixwest. Wan tu ji min dixwestî... Vaye tu standî... Ma tu qet têr nabî ji evîna dilan çiya! De bila li te pîroz be! ...

Çiya li ber çiyan çendî stûxwar in
Bî terazin û mêrg in, tev avên sar in
Rûbar dikişin tu dibêjî qey mar in
Her bihosta wan ji te re war in...

2004-01-21/Amed

Ömer Dilsöz

Çûyîna Bêwext

her bi xwe dikir
diçû
ber bi pêjna dilê xwe
di nav bédengiyê re
bi hêminî
bêpêjn
û bi tena serê xwe

li ser rû,
kenekî tîrş xwe dida der
çavan bîposîde dinêrî
lê tu car
bes tu caran serî neçemand
li ber tu kesê
tu car nihişt neyarên wî
lê kêfxweş bibin

her serbilind bû
wekî qertelekî asîl
dizanî xema xwe
bi sîleha milê xwe bipêçe
berê xwe bide wêrana dilê xwe
û lê çal bike
hemû birînên xwe

2003-12-01/ Amed

Ömer Dilsöz

Dêdem

1

Dêdem, dîdem ma tu bêzar nebûyî ji payîna deman!
Istirî bi şûna wuslatê dikevin riya te, li her fetlokan
Li xwe binêr; hişyar be û bihêle vê rojiya bêzeman;
Şiv û paşiva te, ma dê her tim bibe ew jana bi kovan?
Ax û fixan ma dê tim li derdora te biçerxînin perwazan?
De bişkêne vê rojiya giran; ne Beraet e, ne jî Remezan!

Dêdem, êdî vehêle vê sûnda rikîn, vê asoya bêsînor!
Wekî bilbilê tûxwer gêj û mendehûş digeri li derdor
Ev çi rojiya bêwerz e, ku berê te dide riyeke kendekûr?
Dil li ser kaniyên sar re dibore bê ku qurçekê bidaûr!
Çav ji bendemaniyan westiyan, rijiya tev fer û nûr
Bila cejna dil bêtin; bi dûmahîk bêt, disoje ev tenûr!

2

Şêrekî qefeskirî ye ev dilê birîndar
Umreke sax lê borî her daxîdar
Ken mişext bû, rondik hatin xwar
Roj û şevê bê navber her hêvîdar
Ariya dil her gur bû, ma bê hawar
Nema tu hatî ser vî dilê tar û mar! ...

&

Dilê birîndar her bi dax û janan gevizî
Inta evîne vegirt û gurçik pê derizî
Lêvan ken ji bîr kir, rondik her dilîzî
Ser rûyê şikestî tên xwar û her direqisî
Ofên û axî ji zimên tên bi merezî
Zû were dêdem ev dil bi eşqa te rizî! ...

Ömer Dilsöz

Di rûyê te de li rûgeha rûyê xwe yê nepenî digirim

...hilbijartina mirov a dilînî kesayetiya mirov dide dest

Li rûyan dinêrim. Li rûyên mirovan. Li veşarteya rûyistana rûyan digirim. Xemgînî, hezkirin, nefret û xem hemû di rûyê mirovan de veşartîye. Belkî jî nepenîtiya mirovan tev xwe di rûyê mirovan ê nepenî de veşartîbe... Lê her rûyek rastiye e. Di nava ew qas rastiyan de li rastiya xwe digirim. Hingê dibêjim gelo rastiya min di kîjan rûyî de veşartîye? Rûyê ku ez lê digirim rûyê kê ye? Hingê careke din dipirsim, "Gelo ma mirov mecbûr e ku li rûyekî bigere?"

Stalayta hestên min li rêgeheke vala dizivire û digere. Diçe. Di nav ew qas rastiyan de li rastiya xwe digere. Rastiya xwe di rûyekî zelal de... Di rûyekî ku rastiya min lê niştiye de. Di rûyekî me yê ku rastiya min lê veşartîye de li rûyê xwe yê nepenî digirim. Ji ber ku rûyê hezkiriya mirov rastiya mirov a kûr e. Kesayetiya mirov e. Kûratiya hest û zîhna mirov e. Hemû çal û hîmên zîhn, hest û ramanên mirov di rûyê xweşdiviyê de veşartîne. Mirov ji kê hez bike mirov wisa ye. Mirov çawa hez bike rûyê mirov ê nepenî visaye. Hezkirî rûyê mirov ê veşartîye. Ji ber ku hevîyar ji axa hev in; wisa, heçko bi heman axê hatine hevîrkirin. Ji ber ku havênê hezkiriyan ji heman riwêştê ye.

Lê digirim. Di nava ew qas rûyên xweşik û xapînok de li rastiya rûyê xwe yê veşartî digirim. Neynika rûyê mirovan çavên wan in; awirvedana wan e. Çav neynika dil e. Rûyê nepenî di kûrahiya çavan de veşartîye. Li çavên mirovan dinêrim. Her çavek rastiye e. Di nava ew qas rastiyan de li rastiya xwe digirim. Li velerza dilê xwe digirim. Di velerza dilê min de hemû tirs û xweziyên min, hemû şikeste û destkeftiyên min, hemû ders û tecrûbeyên min veşartîne. Li vebîra xwe vedigerim û di nav re digirim; li qonaxên jiyana xwe digirim... Şer û hevrikiyên xwe li ser mêzîna mantika xwe dipîvim; kêmasiyên digihêjim wan. Tê de rûyê min ê nepenî heye û hingê ew li ber min xuya dibe; li ser wî gîsî û kul hene, birînên ku hê jî jan didin hene, şahî û kêfxweşiyên biçûk û mezin hene... Dûr û nêzik kes û kesayet hene; protîp hene, modeltîp hene û hemû jî bi tevnê tirsê hatine pêçan... Tirs hene; lewma gava ku li rûyan dinêrim tirsên xwe dibînim. Ji lew re zû bi zû tu rû dilê min germ nakin û hestên min bi tu awirvedanan bi pêlan nakevin. Hingê stalayta min rêgeha xwe diguhêze û ber bi rûyistaneke nediyar ve diçe...

Li rûyê kê digirim gelo? Li rûyekî çawa? Kîjan rû xewn û xeyala min e? Ez di kîjan rûyî de veşartîme? Di rûyê kê de? Li rûyistana rûyan li rastiya xwe digirim. Li rûyê xwe yê nepenî... Ji zîhna xwe dipirsim, ji raboriya xwe dipirsim û ji xweziyên xwe dipirsim. Ji rûyê xwe dipirsim... Rûyê min jî min ditirse; ez ji rûyê xwe ditirsim. Rûyê min dişkê û wekî guleke bê av mayî hêdî hêdî diçilmise. Ez hê jî li rûyê xwe yê nepenî digirim di nava rûyistana rûyan de. Lê rûyê xwe yê nepenî nabînim. Rûgeha rûyê min hê jî li ber min windaye. Hê jî stalayta hestên min li valahiya rûyistanê digere û hê jî negihîştîye rêgeha rûyê min ê nepenî...

Li rûyê xwe yê heyî dinêrim; dipirsim di ber xwe de, gelo ez li spehîtiyê digirim? An jî spehîbûnê... Qey ez li zelaliyê digirim? An zelalbûnê... Nexwe ez li rastiye digirim? An jî rastkirinê... Ma ez li jêhatiyê digirim? An jî jêhatîbûnê... Ez li rûyê çî digirim; di kîjan rûyî de li xwe digirim? Rastiye min, xewn û xeyalên min, îdealên min, spehîtiya min, jîriya min... Kîjan? Hingê ez li kêmasiyên xwe digirim; li nava vebîr û hafizaya xwe dikevim... Radikim û datînim lê rûyê min ê nepenî hê jî ne xuya ye. Qey ez li kêmasiyên rûyê xwe yê heyî digirim?

Hezkirina mirov rastiya mirov a herî masûmane ye. Hezkirin hişmendiyeke di tama zaroktiyê de ye. Hingê qey mirov li rûyê xwe yê zaroktiyê digere. Rûyê zarok ê xweşik

û zelal... Qey mirov li çavgeşiya zarokekê digere? Ma dibe? Dipirsim... Li nava rûyistanê dikevim wekî parsekekî rû bi rû li te digirim. Li rûyê xwe yê nepenî... Ma mirov li keserên xwe digere? Qey mirov gerokê wan tiştan e yên ku mirov nekariye bijî? An jî encama hemûyan e lêgerîna mirov? Qey mirov li parçeyên rûyê xwe digere? Ma rûyê mirovekî çend parçeye? (...)

Hê jî dipirsim. Lê difikirim; li bersiva pirsên xwe digirim. Li parçeyên rûyê xwe digirim. Parçeyê zaroktiyê, parçeyê ciwantiyê û parçayên din... Parçeyê li nav malbatê, parçeyê li nav civatê, parçeyê li nav jîngehê û parçeyên dîtir... Hemû parçeyên rûyê xwe yê nepenî... Îxanet, bêbextî, keser, kul, hejarî, dewisandin, tenêti û azwerî... Li rûyê xwe yê ku dê min ji tirsî tunebûnê rizgar bike û ber û fêkiyê min li ser jîngehê belav bike digirim. Ji nava ev qas parçeyên rûyistana rûyan de li rûyê xwe yê dîtir digirim. Ew rûyê ku dê vî agirê tenêtiyê di nava ruhê min de vemirîne û rûyê min ê nepenî bibîne...

Li rûyên geş dinêrim. Kêf û şahî, hezkirin û tîna jiyanê min dipêçe. Xeman ji bîr dikim. Tavilê geş dibe rûyê min ê nepenî. Sînyalên hiş û mejiyê min hemû dikevin nav lebatê; ruhê min vedigeşe û rûyê min ê nepenî li benda çirûskekê disekine. Hingê rûyê geş li xweşa min diçe. Evîn mirov bi dû xwe ve dibe; te dikêşe xwe wekî gerasîska avê... Lê heke ji aliyên din ew tîrêj venejenî tu radiwestî û êdî hestên te ji wê rêgehê derdikevin û hingê tu di rûyekî din de li rûyê xwe yê nepenî digerî.

Hê jî nizamî rûyê min ê nepenî di rûyê kîjan gulê de veşartîye. Lê gelek caran ez wî rûyî radibihîzim. Gelek caran ew ji xeyalekê dûrtir dibe, hin caran jî hilma wî li pişt guhê xwe radibihîzim. Jixwe gava ku ez şikestekê dixwim bi dilekî tijîdaxwaz li wî rûyê xwe digirim. Dixwazim ku li nik min be lê qet nabînim û hingê tenêti wekî êşeke giran xwe berî ruhê min dide. Hingê di nava rûyistana rûyan de hemû rû ji min re dibin sehm û ez di hemû rûyan de tenêtiyê radibihîzim. Tenê li rûyê xwe yê nepenî digirim lê min hê jî ew nedîtiye.

Her rûyekî nêzik ku di jiyana mirov a civakî de bi rengekî bi mirov re têkildar dibe parçeyekê ji xwe dide rûyê mirov. Hingê rûyê mirov ê heyî ji derdora xwe bi sedan parçeyan distîne û ji wan jî teşe digire. Lê rûyê mirov ê nepenî ji van vedertir e; tenê di kûratiya ruh û mejiyê mirov de hêlîna xwe dikole. Ew ji hemû spehîti, xwezî û keserên mirov pêk tê lê tu caran jî ew rûyê mirov dibîne van pêdiviyên mirov hemûyan çareser nake. Tenê hezkirî kilîta deriyê çareseriyên e. Ango hilmeke germ a vejandîna hestên mirov ên xweşbîn e. Yanî bawêşîneke hûnik e bo hênikirîna kelegerm û kelejana tenêtiyê ya ruh û mejiyê mirov e.

Stalayta dilê min li rûyistana rûyê nepenî digere. Di hin rûyan de tîneke germ, di hinan de sehmeke har, di hinan de piştrastiyê, di hinan de hêvîşkestiyê, di hinan de xemsariyê, di hinan de bêbextiyê, di hinan de bêsiûdiyê, di hinan de nankoriyê û di hinan de jî kêfxweşiyê dibîne. Ji hemûyan jî parçeyekî distîne. Her wiha li nik hemûyan jî li 'te' ya ku di rûyê min ê nepenî de xwe veşartîye digere.

Umrê min ji lêgerînê westiya lê ez hê jî li rûyê xwe yê nepenî digirim. Carina gelekî nêzî dibim lê hê jî min ew nedîtiye. Dizanim ku ew gelekî ne dûrî min e, lê nabînim ka li ku ye û ew rûyê ez lê digirim rûyê kê ye? Stalayta hestên min hê jî li valahiya rûyistanê dizivire û li rûgeha xwe digere. Rêgeha rûyistana rûyê min ê nepenî gizêna dilê min e...

Gizêna dilê mirov di kîjan rûyî de veşartîye. Kîjan awirên germ, bişirîna şirîn, axaftina nerm gizênê dixê dilê mirov? Ji ber çi tiştî gizên bi dilê mirov dikeve? Antenên dilê xwe

liba dikim û stalayta dilê xwe li valahiya rûyistanê girêdidim; gelo li kîjan rûyî veşartiyê gizêna dilê min? Çi tişt dibe sedema raperîna hest û dilînên mirov? Pîvan û rêgezên gizêna dil çi ne? Li xwe digirim; dikevin nav reh û rîşên xwe û tê de diçim xwarê. Ji raboriyê çend keser û xweziyên xwe yên dewisandî dibînim. Gelek xweziyên ku min hingê gelek xwestibû bidest bixim lê ku min bidest nexistibûn tên bîra min. Hingê gizên dikeve dilê min; difikirim ku hê jî şikestina wan xweziyan wekî kulekê di kûrahiya dilê min de jan vedide. Hê jî wekî xewneke nîvcomayî hestên min dixwazin min li wan deman vegehin û di nava wan xweziyan de rûyê min ê nepenî nîşanî min bidin... Lê ne ez ezê berê me, ne jî xweziyên min; ne jî dil maye dilê caran... Hingê rûyê min ê nepenî hê jî li 'xwe' digere. Hê jî di rûyê mirovan de li rûyê te yê ku rûyê min ê nepenî tê de veşartiyê, digirim.

...tu hê jî wekî sîtavkekê geh xuya dikî geh jî winda dibî.

2004-09-21/ Amed

Ömer Dilsöz

Dilê min întihar dike

Li ber pencereya dilê xwe rûniştîme. Li derveyî xwe dinêrim: Pîvok şîn bûne. Bihar di kamlana xwe de ye. Lê dilê min bi tirşebayekî xemgîn re dikeve xirecîreke kurtedemî. Ji nişka ve kuleke nenavkirî tê û li ser dilê min rûdine. Ruhê min diêşe. Dilê min xwe bi sêdara çavên te ve dadileqîne. Dilê min întihar dike! ... Xwe dîkuje. Hingê pîvok hêdî hêdî li bin sîbera sêdarê diçilmisîn...

Of bêbextiya dinyayê of!

Biskên te yên rengçiya li ber hûnebayê biharê dihejin li hinda sêdarê. Dilê min bi sêdarê ve helawîstiya û xwîn jê diherike ser axê, ax digirî û ji rondikên axê pîvok serê xwe radikin. Bi xemgîniyeke sar rondikan dimêjin. Rondik ji cihê kul tîn, lewma ev kulên ku ji dilê min ê daleqandî yê birîndar derdikevin li rehên pîvokan belav dibin. Ew dinalin. Stûyê wan dikeve ber û pîvok careke din hêdî hêdî diçilmisîn... Dilê min întihar dike li ber sêdara awirên te.

Of duseriya jiyane of!

Çavên te yên reş mîna nermebayê zozanan li ser dilê min divezin. Heçko di spêdeyeke zû ya zozanê de, li bin reşmalekê, li ber hewayekî hûnik bêhna şîrê germ ê hêjdotî bikeve nava dilê min, wisa mendehûş dibim. Awirên te wisa germ dike nava min. Wekî tîna şîrê germ dipêçe giyanê min. Hingê li terazina dilê min sosin û binevş çîlên xwe davêjin. Pîvok dibişirin bi hemû spehîtiya xwe û nermebayekî sivik bi ser giyanê min de tê û min dipêçe. Hingê dilê min li bin sîbera çavên te xwe bi sêdarê ve dadileqîne. Pîvok serê xwe di ber xwe de xwar dîkin û dilê min întihar dike... xwe dîkuje...

Of duberiya gotinê of!

Vedigerim ber pencereya dilê xwe, îcar li hundir dinêrim. Li xwe. Ez di nava pêlên har ên gotinan de wînda bûme. Gotin min dixwin. Gotin min dimêjin. Wekî pindekê, wekî kurmekê... Dilê min hê jî bi sêdara çavên te ve daleqandiye. Li ber germahiya hesretê dipêje û dilopeke avê dixwaze ji destên te. Lê nafiye. Tu dilovaniyê pê nabî û ji kerba dilê xwe, dilê min dişewitînî. Kerbên xwe ji min distînî. Hingê pîvok li ser axê dinalin û stûyê wan di ber de dişkê. Lê hê jî dilê te hênîk nebûye û hê jî tu dixwazî êşe bi dilê min ê daleqandî bidî kişandin... Lê zîmanê min nagere ku ez ji te re bêjim, "insaf zalim" jî. Hingê dilê min careke din xwe dîkuje û xwe bi sêdara awirên te yên germ ve dadileqîne. Dişewite.

Of serşoriya evîne of!

Ji xwe digirim û li te dinêrim. Xwe jibîr dikim, ji ber ku evîna di nava min de min bi min dide jibîrkirin. Ez di kûrahiya çavên te de li xwe digirim û ji xwe digirim. Gêj im. Wekî sergêjiya bermirinê, wekî sergêjiya berfirînê, wekî sergêjiya birîndariyê, wekî sergêjiya jêhrxwariyê, wekî sergêjiya evîndariyê... Hingê li ber sêdara çavên te dilê xwe dikim gorî û wekî qurbanekî radixim ber piyê te. Ji dilê xwe re bi dengekî kelogirîn dilorînim helbestekê:

Ji bo te çi bêjim dilo?
Peyv di destê min de dilerizin
Lê,
Ez dizanim biçim jî
Bêdeng...
Ji cihê ku lê nayê xwestin

Ji bo te çi bêjim dilo?
Gotin di ruhê min dişkên
Lê,
Ez dizanim dûr jî bikevim
Bêpêjn...
Ji warê ku evîna min tê pêpeskirin

Ji bo te çi bêjim dilo?
Rondik li ser rûyê min ziwa dibin
Lê,
Ez dizanim bêdeng jî bimînim
Bê gazin...
Li ser rû kenekî derew bibarînim

Ji bo te çi bêjim dilo?
Xwîn li demarên min har dibe
Lê,
Ez dizanim rawestim jî
Bi hedar...
Li benda heyameke ku nayê dîtin

Of sergêjiya revînê of!

Li ber pencereya dilê xwe diwestim. Xav dibe hemû bedena min. Li xwe dinêrim û xwe sêdar dikim; ji ber ku nizanîm min çawa ji te hez kir... Ji ber ku nizanîm min ji bo çi ji te hez kir... Ji ber ku nizanîm ez çawa bi nav sîpelên evîna te ketim û min wisa zû bi zû, demildest xwe berze kir? Nizanîm û nizanîm lê dilê min di depê singa min de dipêpê, çogên min sist dibin wexta te dibînim... Lê nizanîm ji bo çi? Ji lew re dikim ku birevim ber bi warekî nediyar ve. Hingê dilê min întihar dike... xwe dikuje... û xwe bi sêdara çavên te ve dihelawîse. Digevize. Pîvok careke din diçilmisin û ruhê min jan vedide.

Of xemxuriya şevînê of!

Ji xwe nefret dikim. Êdî dilê min li bedena min giran tê. Ji min tê ku wî parçe parçe bikim û ji singa xwe bavêjim da ku bes jan bide. Tarî dibînim her tiştî; tarî û sar... Giyanê min di bin kelebayê awirên te de dicemide. Şev vedigerin ser şevînan û xew terka giyanê min dike. Hişyar dimînim heta berbangî; çavên min li valahiyê dinêrin û ditirsim ji raman û hestên xwe. Çendî nexwazim jî li her derê tu têyî bîra min, gava çavên xwe datînim ser hev tu têyî pêş çavên min. Qey dîn dibim? Nizanîm. Lê ji halê xwe qet kêfxweş jî nîn im. Tenê gazinekê ji te dikim, "Pa çi heqê te li ser min hebû? Jixwe ez di dinyaya xwe ya tenê de dijiyam..." Lê belê tu li min venagerîni, ji ber ku tu ne li wê derê yî... Ez tenê bi xeyala te re diaxivim lê di nava min de her gav tiştek ji min diçe û hesteke min a dîtir giyana xwe radestî şevîna evîna te dike. Nexasim te hay ji tiştekî jî nîn e û tu nizanî ka ez heme, an tune me jî... Hingê careke din dilê min xwe dispêre sêpiyên sêdara çavên te û xwe pê ve dadileqîne. Pîvok jî dibin pûş û bihara li ber pencereya min cihê xwe ji payîzeke bêdem re dihê. Ez dimirim û tu bi mirina min jîn dibî...

Pîvok bi nermebayekê re liba dibin û dilê min bi sêdara çavên te ve daleqandî dimîne.

Ömer Dilsöz

Dilistan

Heke dil, dil bûya;
Dilê wêran bê rik û bê kul bûya
Minê dil bikira warê jiyânê
Gulistana hemû rengên gulan lê

Heke dil, dil bûya;
Wekî dilopek ji barana havînê bûya
Minê dil bikira qesra evînê
Li wê dîwana reqs û semah tê.

Heke dil, dil bûya;
Dil bi ray û tevbîr bûya
Minê dil bikira hêlîna evînan
Li cîhaneke hemî azadî lê.

2003 /Duhok

Ömer Dilsöz

Dilopa Hêviyê

Wekî dilopekê yî tu
zelal û bijûn
Nerm,
Dilovan,
Bibiryar,
Xweşik û spehî...

Wekî dilopekê;
Hêdî hêdî biherike nava dilê min,
Wisa bi zelal û bijûniya xwe...

Kanî dilop?
Kanî li ku ye ew avzema min?

Wekî dilopekê;
Xwerist,
Xwerû,
Û dilpak hembêz bike min.

Dilopeke ava baranê;
Dilopa şiliyê,
An a avzemên mêrgan,
Keviyên berfê;
Li newal û mesîlan...

Dilopa avetîrkan;
An nixteya payîzê,
An teviyeke havînî,
An jî bêje?
De bêje tu ji kîjan çiya dizêyî?
Ji kîjan latê hiltavêjî?
Ava kîjan axê yî?

Dilopeke hêviyê yî tu...
Ji tîna çavên te,
Ji girnijîna li ser lêvên te,
Tijî evîn;
Zelal,
Xweser,
Paqij,
Bijûn! ...

Ji axa welatekî veşartî;
Kesnedîtî;
Kesê pê lê nekirî...

Ji bin tahtikên berezîvî,
Di nav keviyên berfê re,
Hêdî hêdî;
Zelal,
Xwerû,
Û bi bilqebilq hiltavêjî...

Dilopek î tu
Ji dilopa ava Zemzemê;
Ji axa beyar,
Dilopa kaniya Berçiya,
Rûbarê Geliyê Xanê;
Ji rêzikên Ehmedê Xanî,
Ji paxila çiyayê Rêjgarê,
Ber bi Gûzereşê ve diherikî...

Zelal,
Şafî,
Û bijûn...

Ji zozanên Xelatê;
Li nik Xec û Siyamend,
Ji dilê Cudî;
Bi azweriya Egîdekê,
Dibî Mem û Zîn...

Û tu;
Tu dilop! ...
Diherikî ji Feraşînê;
Li nav mêrg û çîmenan,
Bi delodîniya hespekî çarbazkî;
Diçehînî meydanên zoman.

Dilopek î tu
Ji çar rexên welatê min dizê,
di rojên mirinî de;
Û vedijînî biyabanan;
Xwezaya bejî,
ya rût û ziwa.
şîn dikî gul û kulîlkan.
Avzêl têxî welatê bermirinê
û hêviyê didî jiyanê! ...

2002/ Wanê

Ömer Dilsöz

Dilopek ji Demên Winda Diniqutî

Dilê demê tune. Hestên wê jî çu nîn in. Dem, ji çu nifşan jî nîn e. Ji çu nijadan jî... Girêdayî çu ol û mezheban jî nîn e. Welatê wê, ernîgariya wê jî tune. Dem her tiştî dipêçe; çî şênber, çî razber... Dem bi her tiştî dikare. Destên demê ewende dirêj in ku dikare xwe bigihîne her cihî. Çu qedexe li pêşberî wê nîn in. Zagon nikarin demê bigirin dest. Dem herikîneke bêrawestan e. Her tişt di coxîna demê de gêre dibe. Çu kes nîn e ku di bin aşê demê de neyê hêrandin.

Û demên winda...

Xelekên rabûriyê yên ku xwe bi nava ruhê me wer dikan. Hafiza û jêrhişê mirov ê ku ji demên çûyî sîtavkekê digihîne dema ku mirov tê de ye. Demên ku vegera wan nepêkan be, lê xweziya wan her tim di nava mirov de jan vedide... Şeva dîtir ji nav xelesa dilê min dilopek niqutî. Wextên min bûne xewn û daketin ser hişê min. Ez gihîştibûm nik te. Ez, vegeyabûm wan demên winda û heyamên bi te re duhare dibûn. Keleke bêpayan, janeke bêderman û kuleke sojer di dilê min de radiperiya. Eşgeha jiyane li nava giyanê min akincî dibû...

Lê di rastiye de min tu winda kiribûyî...

Rastî û xelesa jêrhişê min li dijî hev bizav dikir. Êdî ew demên bi te re min ji dest dabûn. Min winda kiribû. Ez têk-çûyî-bûm. Lê bayek bû, ku radibû. Bahoreke sivik bû, ku ji xelesa deman xwe di ser min re ba dikir. Kelek bû, ku ji nava dilê min hildiçû û ez digihandim sîtavka demên ku bi te re reng vedayî. Lê êdî di rastiye de wan rengan tev tûvilê xwe avêtibû û ew behî bûn di çirûskên çavên min de...

Ji demên winda dilopek diniqutî ser ruhê min.

Janeke zirav xwe berî nav dilê min dida. Ez diketim nava wê û bi wê re diqulipîm nav xelekên tenik ên dem û heyaman. Dem diçû. Demê her dem bi ya xwe dikir: Diçû... Ew li ser hisaba tu kesê nedixebitî. Li gorî dilê tu kesê jî xwe eyar nedikir. Eyarên wê her di destê wê bi xwe de bûn. Wekî xwe diherikî dem. Wekî zagona xwe.

Rawestgehên demên min ên winda li nik te bêhnvedaneke kurtedemî pêk dianî.

Tu di nava xelesa deman de ji min dûr ketibûyî. Wekî xewneke zirav diniqutî ser bîranîngeha min. Dilê min diwestiya ji payîna demên nehatinê. Ji demên nediyar ên ku di babelîska hêviyekeke lawaz de diperpitiya.

Şeva daborî ji nav çirûska dilê min dilopeke germ diniqutî. Ez di xewna xwe de di nava deryayeke bêbinî ya zelal de bûm, min avjeniya deman dikir. Ber bi girava rabûriyê ve dikişiyam. Bi melevaniyên giran. Deman ez digirtim nava xwe. Li te digeriyam. Min tu didîtî. Di nava pêleke har a deryayê de; diçûyî ber bi nediyariyekê ve. Ber bi sîpelên har ên deman ve diçûyî. Bêyî xatirxwestin. Min -nik dilê xwe- tu ji bîr kiribûyî, lê dem û heyamên winda jî tu ji nava rondika çavê min nerenî bûyî. Min bi hemû kela dilê xwe berê xwe dida te. Lê wê pêla har tu jî pêş çavên min winda dikirî.

Dilopek ji demên winda li ser rûyê min gêr dibû.

Dem winda dibûn hêdî hêdî. Em ji nav deman derdiketin; duh û îro tev têkil hev dibû li cihekî. Li çîva serê riyekê. Li bihûrê teng ê geliyekê. Li dora agir, li bereha çiyayekê. Li ser lîsekê. Li nava xewnekê... Perdeyeke tenik î zirav a rengbehî xwe dida ber rastiya me. Li ser xêzikeke zirav meşeke giran dest pê dikir. Giyanê me xwe berî hev dida.

Giyanê me diqulipî nav meydana bîranînan û li dora hev diziviriya. Me tîrên bi jehrîn difirandin hev. Rim li hev didan. Şûr ji kavlanan dikişandin. Em êdî du glodyatorên hevrik bûn di nava meydana heyaman de. Tevî ku dilê me ji bo hev diheliya jî...

Hingê rondikên dilê te ji kaniya çavê min diniqutîn.

Em çend parçe bûbûn. Çend serî, çend binî; lê yek dil û hezar mejî. Tîrên bi jehrîn berî dilê me diketin. Dilê me dibû dîl di destê parçeyên me de. Hingê rondik li ser rûyê me hişk dibûn. Hingê qêrîn di qirika me re difetisîn. Xwezî peregende dibûn û her yekê xwe dispart şikerê. Demê careke din tinazên xwe bi me dikir û li wê de, li pêşberî me ji kenê qeşmerane zikê xwe vedipeland.

Hestên min diperçiqîn.

Hestên bêwar li nava tûnela demê digevizîn; ji wî serî ber bi serê din dihatin û diçûn. Xelekên heyaman hest dipêçan û di nava xwe de dişidandin. Rondikên hestan dibûn rûbareke boş û li nava parçeyên min û te diherikîn. Parçeyên me êdî ji hev veqetiya bûn. Di nava wan de du rûbarên boş ên ji kaniya çavên me dizan, li ser sînga me cuh û cobar kola bûn û tê re bi hêminî diherikîn.

Min di xewna xwe de tu dîtî...

Şeva çûyî li nav xelekên hizran dilê min xwe digihand te. Di ser kêlestûna demê re derbas dibûm û werareke heyaman di nava ruhê min de werdiçerxiya û ez davêtim ber deriyê dilê te. Wext deh sal berê bû... Deh salan ez dadiketim nav tûnela zirav a heyaman û li ber deriyê te dinişim. Lê çavên te hemû çirûskên germ winda kiribûn. Awirên te sist dinêrîn. Li ser rûyê te westiyana salan a piştî sî salên ku pêkan e wisa lê bên, xwe darêtibû der. Careke din dem û heyaman xwe berî hev dabû û ruhê min di helkehelka westiyaneke bêpayan de dernixûn bûbû û li erdê dinêrî...

Erd diqelişî û ji demên nezayî dilopek diniqutî ser çavê min.

Rast bû, erê rast bû ku min gelekî bêriya te kiribû. Ku bêhna te dihate min. Tîna te ez vedigirtim. Pêjna te ez dipêçam. Erê rast bû ku min dilê xwe di nava dem û heyaman de li rawestgeha te çal kiribû. Te giyanê min dimêt. Te xwîna min dixwar. Te hestiyên min dikojin û vedirojin... Lê, dem diçû. Parçeyên me mezin dibûn û wan hest dikir ku me bibînin. Hest dikir ku em vegerin ser hêlîvanka xwe. Hest dikir ku em ji nava deman derkevin û xwe bavêjin ser rûzemîna evîna xwe ya winda...

Lê me hev winda kiribû.

Birîna kul zû bi zû nayê cebirandin. Hestên me hêdî hêdî dernixûn dibûn û mîna şilêrekê stûyê wan di ber de xwar dibû. Wan li axê dinêrî û ji bo min û te dikire girî. Lê dem û heyam li ber sînga me wekî pejanekê çikilîbû û her roj daveke dîtir a spî li ser porê me dirêst. Her roj xêçikeke kûrtir li ser demê me dikola û her roj piçektir piştî me xwîs dikir. Umir di destê demê de digeviziya û evîna me jî di nava kakila wê de sortir dibû û her roja paştir bêhtir dişewitand dilê me.

Tenê me ew dil mabû.

Dilê me dilop bi dilop diheliya ser demê. Ji nav heyamên winda velezreke mezin dihejand giyanê me. Hingê ez hişyar bûbûm êdî û li wê derê, li ber pencereyê dengê

bangê bêwext ê dîkê sor deng vedida.

Ömer Dilsöz

Dîmena reş û spî

dîmeneke reş û spî
ji nav rojnûskeke qurmiçî
ji rojên bihareke nûpişkdayî
min dît
di çirûska çavên te de
erê keça Helepçeyî

min dît
zêmar û hawar bû dayikan
li ser cendekên parçekirî
'kurê min... keça min
ax ez gorî, dayik nemîne
ma çi hawara te bû! '

erê keça Helepçeyî
ji nav çavên heyvê
di nava fêrmiska ewran de
wekî birîna xerdelê bariyayî
û ketiye nava dilê min
lê venûsiyayî

Ömer Dilsöz

Dizivirin Hestên Min

hestên min wekî mizrahekî
li dora xwe dizivirin
wekî derwêşekî Mewlewî
dizivirin û hey dizivirin
li beramber,
li seranser,
di nava bêdengiya dil de,
bi hêminî,
bi sermestî û her dizivirin

zivirîneke bêpayan
wekî gerasîska pêlên har
wekî babelîska bayê kur
wekî perwazên teyrê sîxur
wekî gurîska agirê gur

dizivirin hestên min bi sergêjî
bi delodînî,
bi kihêlî,
bi evîndarî
bi dilsarî...

diçerixin hestên min bi melûlî
li nava deştên gever î fireh
bi tena serê xwe
di çilê zivistana zemherîr de
bi dû dewsa sîberekê

şev diçin,
sar
roj diçin
sar
meh diçin
sar
û sal diçin
sar

dipelînin hestên min ji nav tûvilê xwe
bi ser berdayî
bi dil daxdayî
bi çav kildayî
bi dest hinedayî
ber bi xwekuştinekê ve

têkil hev diçin
têkil hev tên
têkil hev har dibin
têkil hev sar dibin...

dikelijin,
vedimirin
geş dibin,

diçilmisin
li gel biharekê
li gel payîzekê

digerin hestên min li biyabanan
li dor strîdankan
li ser kulîfekan
li pesaran
li gund û waran
li ber baranê
li ber berfê
li bin hetavê
li gel hîvronê
di bin çilvilîna stêrkan de
li gel jîvanên nepenî
xwe bi razên dilan wer dikin...

dibihûrin hestên min
di ser milan re
di nav şikêran re
di bin teşaran re
li gel sergêjiya dilê xwe

dizivirin hestên min ji gerê
ji kulînên bin erdê
ji nav dilê zindanê
ji tarîsana goran
ji dil-lerzika sêdaran

dizivirin hestên min li dor gêrê
li nav coxîna jîyanê
di bin simên siwariyan de
ji bêhna keliskên hespan
li gel gêjevanka zarokekê

dilê min dizivire li nav babelîskekê
li gel bêhna nanê sêlê
ji berbiska şorbûyî ya dayikekê
ji gurîska har a tenûrekê
ji dilopa xwîdana eniya nanpêjekê

hestên min dizivirin mîna widrê sofiyekê
mîna semaha pîr-elewiyekê
mîna toba reben-îsawiyekê
mîna duaya kal-zerdeştîyekê

hestên min gêr dibin li kendalê jîyanê
di nav gergerên xelekên demê de
bi sehma apoletên nexşîn
ên ser milê komandarên çavsor
dizivirin û her dizivirin
mîna çerxa wergêrana şev û rojekê

dizivirin hestên min ên serberdayî
bi peşkên baranê re
li ser dilê axê
lê dihêwirin
lê belav dibin
hingê dimêje ax avê
bi tîbûna hezar salî
bi hesreta hezar salî
heta kezebê
heta gurçikê
heta mirinê...

2004-01-06/Amed

Ömer Dilsöz

Ey Felek

Ey felek bibihîze,
ez strana xatirxwestinê dibêjim
dê biçê ji vir jiyana
destê xatirxwestinê liba bûye
ez naxwazim veqetînan
bila her kes
li nik dilê xwe bibe mêvan

Ömer Dilsöz

Ezê Dîtir

1

ew ezê ku di kûratiyên 'min' de veşartiyê
ewê ku 'ez' wî naş nakim
ewê bo min biyanî...
ewê li kûratiya dil xwe li min veşartiyê
ew ezê ku 'ez' qet nizanîm çawayê
ew ezê dîtir yanî
ezê ku min qet nedîtiyê
ezê ku di nepeniyên de digere
û veşartokê bi min re dilîze

2

ew ezê di nava min de
ku dişibe darkirokê
her êvarî tobe dike
û her spêdeya piştî wê êvarê jî
toba xwe betal dike...

3

ew ezê du perçe...
ewê bêpêjn xwe dikuje
û dîsa piştî her xwekustinekê
bi xweliya xwe ve xwe vedijîne

4

ew ezê ku 'min' berze kiriye
û hinde sal in bêrawestan lê digirim
li ser rûyê cîhanê
hin caran di tîna awirên xezalekê de
hin caran di çirûska dilê dayikekê de
hin caran di bişirîna zelal a zarokekê de

5

ew ezê ku bi qasî dîroka mirovahiyê kevin
bi qasî teyrê eylo resen
û bi qasî 'xwe' jî têkçûyî
ew ezê dîtir,
ewê ku bi çarlepki xwe gihandiye asoyên wînda
ewê bi dewisandinan re tixûb çirandine
û xwe gihandiye stêrkan...
ew ezê bûme stêrk

6

ew ezê dengê xwe di nalîna bilûrekê de berzekiriye
ewê di nav pêlên evînê de serobin bûye
ew ezê ji bo evîneke pak birçî
ji bo evîndareke dilsoz bûye derwêş
û xwe bera nav çol û çolistanan daye

7

ew ezê dîtir...

ezê ku di xewnên zaroktiyê de maye
hê jî bi dileke zarokane
bi çirûskekê şad dibe,
bi dilopekê xemgîn...
yanî ew ezê qet mezin nebûyî
qet hînî jiyanê nebûyî
qet neketiye gengeşiyên serdemê
û qet bera nav bayên derdorê nedayî

8
ew ezê min di riya lêgerînê de winda kiriye
ezê winda...
ezê kena 'wî' li ser rû tirs bûye
rondik di çavan de hişk bûye
ezê di nava peyvên tûle de gêr dibim
li ser hişkerûyê kaxezên qirmiçî

9
ezê ne ji bo 'xwe' bikarî bijî
ne jî mîfadarê derdora xwe
ezê dîtir...
ewê ku ji nava hemû lîsteyan hatiye renîn
ji hemû heyîyan hatiye vederkirin
ezê ji marî rûstir, ji gurî bîrsîtir
ezê ku 'min' hilma wî seh nekiriye

10
ezê delodîn
ezê bo xweziyeke avis fêk bûye
di nav mij û morana jiyanê de
xwe li hespê hêviyên winda siwar kiriye
û dajot...dajot
li şevexwînên dûvedirêj
ber bi bayê kur,
li gel afriya karwankujan
di nav dilê çiya û baniyan re...

11
ezê ku di şopa xezaleke kûvî de winda bûye
bi tena serê xwe...
li çiyayeke dûr î pişt asoyan
di rojeke ne li salnameyan hatiye tomarkirin de
ne jî di nava rûpelên dîrokê qeyd bûyî de

12
ezê ku bi zêmarên dayikan hişyar bûye
li ser kêliya goreke nenavkirî
ezê bi janên 'min' di xwe de çûye
li nav nameyeke qet rênekirî

13
ezê dîtir yanî

ew ezê ku qet nizane derewan bike
nizane bi ristên 'lê ferz dîkin' bilîze
û rûpoşan li rûyê xwe bipêçe
di nav dubendiyê de bikare bimîne
ew ezê lawaz,
ewê têkçûyî...
ji ber ku nezaniye bilîze

14

ew ezê ku bi senfoniyeke dengketî
strana 'yên dîtir' dinehwirîne

15

ew ezê dîtir,
ezê ku li 'min' digere
ji bo 'min' têdikoşe
ji ber 'min' diêşe
ew ezê ji bo 'min' xwe dikuje
û bi xweliya xwe ve 'min' diafirîne
ezê xwe gorî 'min' kirî...
li welateke hemû êşan pêçayî,
hemû jan lê akincî bûne
û 'jiyanê' di bin xweliya 'mirinê' de aj dayî

16

ezê dîtir,
ango ezê azad
ew ezê ku hê jî kariye xweser bimîne
hê jî kariye bêhna axê jê bifûre
ew ezê ku hê jî 'ez' im...

2003-12-11/ Amed

Ömer Dilsöz

Fasil

Fasila du gotinan;
Ji nav rojên çûyî,
Wextên me yên bêpayan
Demên tu pergî min dibûyî

Li ber dîwarên sar
Di bin hilma felekê de
Bi dileke evîndar
Gotin dimirin di nava me de

Li goşeyên cemidî
Hilma cigara me nivî dikişand
Û berfeke hûrik dibarî
Bi ser me de serma diweşand

Ji bo fasila du peyvan
Vereviyên min û te heval
Evîndarên dizkî û bêpayan
Mîna pezkûviyên bêmal

Du dilên li ber qeşayê
Têde germa havîneke geş
Du dilên ketine tayê
Ji bo fasila demeke xweş.

Berûkên me ji çilê sartir
Xemên me ji kulîkên berfê himbızir
Dostê me fasila du gotinan
Neyarên me ji xîzê pirtir.

Lepikên me hilhilî
Pêlavên me av-vexwer
Li ber dîwarê kavilekî
Cil û bergên me bêserûber

Ji bo fasila du biwêjan
Me hin ber xwe dida
Lê dawiya hemû vîrajan
Te tîra bijehr li min dida

2002-12-09

Ömer Dilsöz

Gidiyorum

İçim üşüyor...
Yüreğim ağlıyor Heval!
Ve ufuklara açmış yelkenlerini
Hayat gemim...
Gidiyorum işte!
Gidiyorum ufukların kucağına;
En sıcak hislerimle,
Özlemlerimle...
Bir sonbahar akşamında,
bir kez bile ardıma bakmadan...
gidiyorum Heval, gidiyorum işte!

Mor dağlarda;
Doğanın kendisini en şade şekliyle hissettirdiği,
O berrak suların kucağında,
Rengarenk çiçeklerin ülkesinde;
Yağmurdan sonraki güneşe dalarak,
Kendi(m) leşerek filizleneceğim Heval!

Tohumunu ekmek için güzelliklerin
Mevsimsiz bir sevda yaşayacağız burada
Miyadsız tarihe isyan ederek,
Kahpe dünyanın kahrını deleceğiz burada,
Deleceğiz Heval!

Ufuklara gider o upuzun yollar,
Ufuklara doğru seyreder...
Güneşeymiş yolculuk
Güneşeymiş Heval!

Anlıyor musun? Gidiyorum işte,
Gidiyorum sensizliğe,
Sessizliğe...ve özgürlüğe!
Yani kendi(m)liğe Heval!

Çulsuzluğun çığlığını yırtarak,
Şefilliğin kahrını delerek;
Boynu büküklüğün hüznünü aşarak gidiyorum,
Gidiyorum sevdama kanat açarak!

Burada güneş bir başka doğar,
Yıldızlar bir başka fısıldanır,
Artık ötesi yok ki ufkun;
Çünkü sen içindesin artık onun.
İçindesin Heval!

Ardarda dizilmiş ışıklara dalar düşlerim,
Ansızın bir serpintiyle,
Yağan ateş meteoru; ateş topları
Ve her birisi bir can yüklü,
Bir sevda tomurcuğu;
Bir hicran çemberi...
Sarar dört bir yanımı;
Ve ansızın sapar düşlerime,
Yakar içimdeki dünyayı,
Yıkar içimdeki özlemleri;
Artık kan damlar kelimeler,
Öfke saçır sözcükler Heval!

İşte o an! ...
O an dört bir yanda seni arar hislerim,
Seni arar gözlerim pırıldayarak...
Seni söyler sözcükler titreyerek,
Seni yaşar özlemler ürkerek, seni Heval!

Başım dik, alnım açık gidiyorum,
İşte o coşkuyla açılmışım ufuklara,
Yönelmişim güneşe sonbahar akşamında,
Yüreğimde serin bir esinti,
Gözlerim çisiyor damla damla hafiften,
İçim yanıyor,
Yüreğim dağılıyor ve gidiyorum Heval!
Gidiyorum işte... gidiyorum

2001-08-23/ Hakkari

Ömer Dilsöz

Gulhinarê

Li ser asoyên zirav
Digel helesorka berbeyanê
Awirên min ên vala dişkên
Li valahiyê dinêrim
Heçko tiştêkî min winda bibe
Li te digerim
Li te Gulhinarê
Û strana te dibêjim:

Reng biharê
Gul hinarê
Çav belekê
Gerden spîndarê

Bi hesteke zarokane
Dilê min diperpîte ji ber te
Ligel her hilavêja rojê
Wexta çavên min hişyar dibin ji xewê
Tiştê yekem tê bîra min
Tenê tuyî Gulhinarê
Û strana te distêrim:

Reng biharê
Gul hinarê
Çav belekê
Gerden spîndarê

Li dawiya her rojê
Ligel xatirxwestîna ronahiyê
Wexta stêrk diçilvilin li asiman
Awirên min ên xemgîn
Li nav hemû stêrkan
Tenê li te digerin Gulhinarê
Û strana te dinihwêrînim:

Reng biharê
Gul hinarê
Çav belekê
Gerden spîndarê

2004-04-02

Ömer Dilsöz

Hemû hestên min ji bo te diherikîn

Zaroktiyê min gelek meraq dikir ka li pişt çıyan çi heye...

Ji nav deman derketibûm, ji nişka ve di navbera xîçikeke zirav a hizr û ramanan de gihîştibûm zaroktiya xwe. Gava ku ez hêj zarok bûm her dem keserek di dilê min de hebû, difikirîm; gelo li pişt van çıyan çi heye? Lê ev kesera xwe her dem min di dilê xwe de veşartibû. Gelek caran ji mezinan bihîstibû ku li pişt van çıyan hinek çıyayên dîtir hene û li pişt wan hinekên dîtir; li pişt wan jî mirov dijîn. Min ew mirov gelek meraq kiribûn.

...
Lê dem û dewrana dinyayê ez mezin kiribûm; çawa ez ew qas zû mezin bûbûm ez qet pê nehesiyabûm. Lê êdî ez derketibûm pişt çıyayan û l inik mirovên dîtir ewên ku di zaroktiya xwe de min gelek meraq dikirin. Min berê ew mirovên bajarên mezin di hişê xwe de gelek cuda hesibandibûn; min li pêşberî wan ji xwe şerm dikir. Gava ku wan tiştê ji min bipirsiya zimanê min bigirê dihat û ez gelale diaxivîm. Min ew li ber çavên xwe gelek mezin kiribûn û min dixwest ku ez jî wekî wan bim. Min gelekî çavdaniya wan dikir.

Piştî salan min dê tu jî yek ji wan bajarên dûr binasiyayî. Nizanim çawa, lê dê dilê min li ser gezinga evîna te bihata gestin û minê gelek ji te hez kiriba. Lê belê minê tu caran ev yek ji te re negota. Wekî zaroktiya xwe minê tenê keserên xwe ji xwe veşartina û belkî jî ezê li benda demeke ku ez jî nizanim kengî ye rawestima. Rawestiyanêke dûvedirêj a ku dê her roj êşêke dîtir li ser kovanên min binijinta. Lê belkî jî germahiya te, awirên yên geş û kenê te yê şirîn bes bû ji bo min. Ez bi herhal gelekî kêfxweş dibûm. Min her roj ji xwe re duaya, 'Baş e ku tu heyî' dikir lê di rastiyê de tiştê nediguherî. Dê rojek bihata û tuyê jî li pêş çavên min mîna kefa sabûnê ji nava destê min bişemitiya û biçûya. A herî dilsoj jî minê nikaribûya tiştê bikira.

Jixwe her tişt wê rojê eşkere bûbû. Wê roja germ. Ew roja ku ez û tu bêdeng li wê parka veder, li bin sîbera bîşengekê, li rexê birka avê rûniştibûn. Min hes dikir ku dê hinek tişt rûbidin. Ji ber ku wê rojê gotinên te gelekî sist bûn. Min seh dikir ku tu jî dê biçûya. Ev jî dê bûya dawiya jiyana min. Tirs û metirsîneke nediyar ruhê min pêçabû. Ramanên min di nava hev de dihatin û diçûn. Lê min nedikarî te rawestînim jî. Ji ber ku te biryara xwe dabû, erê, tuyê biçûya û ezê jî bi tenê mabûma.

Hingê îfadeya dudiliyê li ser rûyê te diyar bûbû. Heçko te dixwest gelek tişt bigotina lê van tiştan dê biryara te neguhartiba. Tu wekî pelê li ber weşyanê bi tayê xwe ve dileqiyayî û piştî demeke kin dê ji darê weşiyayî. Lê ma ew qas hêsan bû çûyîn? Ma ew qas bû her tişt, ku dê bi gotinekê bihata qedandin? Nizanim. Min qet nedizanî ka li ser dilistana te kîjan ba û bager diveziyan. Min qet nedizanî ka di nava hişê te de kîjan hizr û raman hebûn... Lê çûyîna te ya bê wext û bê sedem ji bo min gelekî dijwar bû. Qey dê roja min bêyî dîtina çavên te yên geş dest pê bikira? Qey dê êdî min tu nedîtibûya?

Hê jî tu bêdeng bûyî û em di ber hev re dimeşyan ber bi qonaxêke nediyar ve. Tavê êdî bi giranî tîna xwe şikandibû. Bayekî gemore dihat. Ji germa erd disincirî. Meha Tebaxê bû. Li wî bajarê navdar ê ku em gihandibûn hev êvareke dîtir hêdî hêdî xwe berdida ser jîngehê. Em bêdeng dimeşyan. Carina min dikir li rûyê te binêriya lê te berê xwe nedida min. Tenê te li beriya xwe dinêrî û tevî hizrên kûr hêdî hêdî dimeşiyayî. Heke te li rûyê min binêriya, heke çavên min li nav çavên te biketa minê her tişt fêm bikira. Te jî ev dizanî, lewma jî tu jî min, nemaze ji çavên min ditirsiyayî. Kengî min li nav çavên te binêriya te her dem awirên xwe dişkandin û te di ber xwe de dinêrî. Tu ditirsiyayî ku ez ji te hez bikim lê ji aliyekî ve jî tu ji min bêhtir hewcedarî hezkirinekê bûyî.

Hingê hemû hestên min ji bo te diherikîn. Lê hestên te belav bûn. Tu, `marî gestî ji werîs ditirsiyayî' û ev tirs te dibû sedema revaneyê. Tu ji hezkirinê ditirsiyayî û jê direviyayî lê gava ku te li nav çavên min dinêrî jî hestên te yên pêçaftî radiperiyan. Nizanim qey dilê te bi min dişewitî? Lê ev nebû. Ev dê nebûya. Ji ber ku evîn divê ne ji minetê bûya. Ne ji dilşewatiyê bûya. Ne jî em hêlînên revaneyên hev bûna... Na. Divê me hestên xwe ji hev re zelal bikirana... Lê, tu diçûyî. Tu li ser çûyîne bûyî. Minê tu caran ev hestên xwe ji te re venegotina. Belkî te jî nedixwest ku min vegotina. Heye ku ji bo me herduyan jî ya herî durist ev bûya? Kê dizanî...

Ez gelekî hînî te bûbûm. Dilê min yekem car bû ev qas germ bûbû. Yekem car bû ku min dixwest bawer bikira ku dosteke min hebû. Bila xweşdivî jî nebûya, dostanî jî min diviya. Lê te behsa çûyîne dikir... Tu dê biçûya ji ber ku te hêj nedîtibû ka li pişt çiyayan çi heye. Hêj tu dê lê bigeriyayî. Li pişt çiyayan. Hêj jî te dê berê xwe bida asoyên bi mijîn û te dê xopana dilê xwe li ber tîrojka asoyên nû vedaya. Tu dê hê jî li pêjna hundirê xwe bigeriyayî. Lê min ew dîtibû êdî. Êdî ez gihîştibûm pişt çiyayan û min ew raz vedîtibû di kûrahiya çavên te yên reş de. Êdî ez li pişt çiyayan bûm.

Hingê ez bi gelek tiştan hesiyabûm; bi jiyan, man, viyan û hezkirinê. Ez têgihîştibûm ka ji ber çi mirov ji bo hezkirinekê hin dişewite. Germahî. Wekî şîrê germ ê spêdeyeke hûnik a zozanan. Wekî bayekî hûnik ê kelegerma germistanan. Ji ber ku gava min li çavên te yên geş dinêrî rajena min diperpitî, lerzîn dikete piyê min. Gava ku min li çavên te yên watekûr dinêrî ez tê de winda dibûm û hişê min ji serê min diçû. Gava ku min li çavên te yên reş dinêrî hemû razên li pişt çiyayan li ber min aşîna dibûn û ez diketim nav aramiyeke bêdawî. Min li nik te ji xwe bawer dikir. Min li nik te ji jiyanê hez dikir. Min li nik te ji xwe hez dikir. Min li nik te xem û kulên cîhanê tev ji bîr dikir. Li nik te dem tunebû; saet çawa diherikîn ez pê nediheşiyam. Ji ber ku min jî te hez dikir lê minê ev hestên xwe tu caran ji te re negota. Ji ber ku tu li ser çûyîne bûyî... Tu diçûyî! ... Tu dê biçûya û ezê jî bimirima! ...

Êdî min qet meraq nedikir ka li pişt çiyayan çi heye!

15_Tebax_2004/ Amed

Ömer Dilsöz

Hilmeke sar e 'tenêti'

Serma... sarî... sarbûn... Gelek zehmet e ku mirov li bin hetavê bicemide û di çilê havînê de bi taya sermayê bikeve. Aha çûyîna te jî wisa bû! ... Tezingeke sar bi ser giyanê min de bire xwarê. Xwêdan da hemû laşê min; xwêdaneke sar. U xwîs bûm ez li cihê xwe. Gotinek bi tenê jî ji zimanê min danehisî. Ez cemidîm û tirseke mezin xwe berî nav ruhê min da... Êdî demildest min her tişt xalî dît... her tişt vala hate pêş çavên min: Xweza; çiya, daristan, rûbar, asiman; stêrk, heyv, roj û mirov... Hemû heyîn, hemû tişt li pêş çavên min qulipîn ser dîmeneke şêlû. Hingê hilmeke sar giyanê min vegirt û min xwe di nava heft milyar însanî de bi tenê rabihîst... Hingê bi pistepisteke nizm çend rêzik ji ser zimanê min daketin xwarê;

Rabe dilo,
dereng e
roj çû
bext nemaye

Min bi çûyîna te re dest bi gazinan kir. Hemû gazinên min ji bo dilê min bûn. Min dilê xwe da ber tîrên gazinan û ew hincirand.

rabe dilo,
dereng e
şev çû
text nemaye

Min dilê xwe kire bêjîngeke qulqulî û raxist nav bêdengiya şevkorê. Li wir, ruhê min cemidî û taya tenêtiyê ez pêçam bi seranser...

rabe dilo
dereng e
umir çû
wext nemaye

Tenêti... Di nava dilê xwe de tenêman... Pir zehmet e ku mirov di nava xwe de tenê bimîne. Mirov ji xwe jî tenê bimîne û bibe biyaniyê xwe. Gelekî zehmet e ku mirov xwe li biyabanekê winda bike û nizanibe ka dê bi ku de biçê. Wekî hilmeke sar di nava dilê biyabanê de dilerize û dikeve nava windatiyê bêpayan. Diqerisin hemû gotin li ser zimanê sirûştê û mirov winda dibe û bi tena xwe diçe û hey diçe...

hilmeke sar e tenêti
di ruxsarê heyvê de
tirseke har e tenêti
di hembêza şevê de
dinale tenêti
di dergûşa mirinê de

Mirov diçe û di ruxsarê heyvê de li beramberî evîna xwe ya winda radiweste û jê gazinên xwe dike bi awirvedaneke sar. Heyv dikene bi halê mirov... Hingê ruhê mirov ditirse ji qehqeha heyvê û tirseke har xwe berî nav dilê mirov dide û lê dinişe. Hingê mirov xwe di dergûşa mirinê de dibîne ku ruhîstin landika mirov dihejîne... Wê demê dê kêfa hemû xêrnexwazên mirov bê û dê awirên wan ên tijî kîn ên ji têkçûna mirov kêfxweş bûyî dê li ser mirov bişemitin... Lê tirs hê jî dê dergûşa mirov bihejîne di bin sîbera mirinê de... Hingê mirov dê çavên mirinê bibîne û dê ji tirsê xwe bi gerdena tirsê werke... Lê tirs herdem landikhejiya mirinê dike...

Wê demê neynik dê mirov bidin dest û dê li nav çavên mirov bikenin. Rûyekî tijî qermûçik dê li rûyê mirov bibişire li berhemberî neynikê... Hingê çavên mirov dê şor bibin û awir biwestin û xwe berî nav bêdengiyê bidin û dê xwe bispêrin mirina xew û xewnan... Hingê mirov dê bi demê re revaneyê bike û xwe bispêre bêdengiyê û di dergûşa mirinê de ji aliyê tirsê ve bête nivandin... Wê demê dê ronahiya rojê tirsê herî mezin be ji bo mirov û mirov dê hertim jê bireve û xwe bispêre reşetariyê û binive...

Binve dilê min binve,
Binve ruhê min binve...

Piştê dê bête dîtin ku mirov bi sertewiyayî di nava şênîyan de winda dibe. Dê lingê mirov sist bigihêjin ser erdê û navmilên mirov dê têk biçin wekî guleke çilmisî, dê reng û rûyê mirov bi demê re bibehîtin... Hingê dê neyar û nemanên mirov ji kêfxweşiyê biwestin û êdî dê nema kêfxweş bibin. Ji ber ku êdî dê mirov hêjayî wê yekê jî nebînin. Bêpûtedan... Lê tirsê dê hê jî bihejîne landika mirov di bin sîbera mirinê de. Mirinê dê wekî hilmeke sar her roj li pey mirov bigere.

Şev û tenêti... Tenêti di hembêza şevê de dinale. Ji destê xewê birîndar dikeve ew. Xew mirov ji tenêtiyê dûr dike. Xew mirov ji jiyanê dûr dike. Lê tenêti di nava jiyanê de mirov ji jiyanê sil dike. Jiyan tamijandîna demê ye û tenêti jî serberdana demê ye... Şev her tiştî vedişêre; mirov jî di nava tenêtiyê de xwe dispêre tariya şevê û ruhê xwe radestî xewê dike. Xew ruhê mirov ê westiyayî dinivîne û wî tena dike... Xew tenatiye... (...)

Piştî çûyîna te ez bi tenê mam û taya tenêtiyê ruhê min vegirt. Ez cemidîm û lerz ketê dilê min. Min hilma sar a tenêtiyê di kûratiya giyanê xwe de rabihîst... Piştî çûyîna te ez bêdeng ketim nav xeyalên xwe û min piştê xwe da jiyanê.

Hê jî ez dicemidîm li wê derê! ...

Ömer Dilsöz

Hingê

Wekî zarokê ji şîr vekirî,
na na,
wekî berxikê dev bizmêk-kirî
dilê min...
te dilê min êxist nav agirî

.....

Hingê

.....

ji çirûska çavên te
min bihareke kemilî dît
lê
tê de şikestibûn hêviyên te
li xwe digeriya

.....

ji kenê ser lêva te
min xemgîniyeke veşarî dît
lê
tê de digiriya evîna te
ji xwe dîtirsiyayî

.....

hingê

.....

wekî berika ji lûliyê veresiyayî
na na,
wekî kulîlka li çolê bêav mayî
evîna min...
evîna min wisa çilmisîyayî.

Ömer Dilsöz

Janda

Janda! ...
Dengê şevê bi ser min de tê;
Xew diçe ji welatê min.
Li ber pencereyê tava heyvê,
Hêdî hêdî xwe davêje oda min.
Û hingê;
Hingê ji nav birka bîrhatinan,
Tu dikevî ser pêlan,
Û diherikî li nava hestên min.

Janda! ...
Bê te me vê şeva lal;
Li ser zimanê min du peyvên tal,
Ji çavên min du fêrmiskên zelal,
Û dilekî westiyayî pîr û kal;
Te dipê, te dipê Janda! ...

Janda! ...
Li ber guhê min pêjna te;
Ji nediyariyekê vedigeze.
Awirên te zindî dibin,
Dinya min pê diheje.

Janda! ...
Tu dibihîzî! ...
Min gelek bêriya te kiriye.
Bêriya çavên te,
Dengê te,
Pêjna te,
Bêjna te,
Xemla te,
Ravêja te,
Û te; te Janda! ...

Janda! ...
Biharê bêhnên xwe ji te dizî ne;
Sosin,
Alal,
Beybûn,
Binevş,
Nêrgiz; tev ji te afirî ne.
Avzen ji zelaliya çavên te hiltavêjin
Kaniya jiyanê yî tu! ...
Kaniya jiyana min! ...

Janda! ...
Jehrkuşa koremarên sedsalê yî,
Jankuja dilê min ê kovandar î,
Dilopek ji derya evînê yî,
Bijûn û paqij...
Zelal û şirîn! ...

Janda! ...
Şev e; şev diqulipe hêdî hêdî.
Hingorê tarîsanê dadikeve êdî
Xew dikeve rehên mirovên vî şarî;
Lê ez,
Ez çavrêyî te,
Li ber pencereyê,
Di nava efsûna heyvtavê de;
Riya te dipê! ...
Riya te Janda! ...

Janda! ...
Sal çûn;
Demsalan rengê xwe avêtin,
Biharan xwe gihand payizan,
Salmane hatin guhartin;
Dinya guherî,
Xwerist guherî,
Heyam guherî...
Şer çû,
Dijwarî bidawî bû
Li şûna bêhna barûtê,
Gul û kulîlk bişkiftin...

Dijmin bûn dost,
Hewa şikest,
Tahlî ma bêpişt...
Maran koç kir.
Dûpişkan bi jehra xwe ve xwe kuşt.
Bes, tu...
Tu nediyar î hê jî,
Tu Janda! ...

Janda! ...
Berfa spî lêkir,
Çiya vehûnandin;
Newal rast kirin,
Aşût û renî hatin.
Tavê lêda;
Germ bû,
Berf heliya.
Çiya û berdol şîn bûn;
Çanemergan cih guhast,
Panav têrxwer bûn;
Pez lê çerî,
Dewar lê beziyan,
Golik lê boriyan...
Janda! ...
Qedexê çiriyan...

Dîsa bêrîvanan berê xwe da zozanan,
Li wir kon vegirtin.

Careke din newalan deng veda,
Ji dengê bilûra zîz a şivanan.
Meşk helawîstin,
Mast kiya;
Nîvişk bi ser ket,
Kire penîr û lorik;
Dagirtin tijî pîsk û telîskan.

Bes...
Bes tu venegeriya,
Venegeriya jî wexerê! ...

Janda! ...
Careke din heyvtava kewçerê dibiriqe,
Leylan dide ser pêlên çemên welatê me;
Ferat û Dicle, Xabûr û Zê...
Careke din di kamla xwe de ne ew,
Bêdeng,
Bêpêjn,
Bê hebûna te diherikin.
Diherikin ligel mezinbûna hesreta dilê min;
Diherikin ber bi deryayekê ve,
Ber bi zeryayekê ve...

Janda! ...
Rê û dirb dûr in;
Bi kend û bend in,
Asê ne;
Û pêlên wan rûbaran dialîsin tahtikan,
Bi sebreke Eyûbî,
Dimêjin dilê wan ê hişkeber.
Ji bo ku lê vebibe rê,
Lê biherike verêj,
Û geş bibin gul û kulîlkên rengîn.

Janda! ...
Heyvtava rengiz;
Li ber pencereyê,
Di giraniya xeweke reviyayî de;
Dipêçe hişê min,
Vedigire dilê min,
Dikole sînga min;
Û pêl bi pêl diweşe ser min! ...

Janda! ...
Bi navê Xwedê! ...
Bi sûnda mezin;
Bi serê te yê nazdar,
Bi wan herdu çavên qendîl,
Bi wî dilê tijî evîn! ...
Sûnd bi navê xudanê mirazan! ...
Min gelek bêriya te kiriye!

Min gelek hesreta te kişandiyê!

Hesreta wan herdu çavên te yê belek;
Bejna narîn,
Bişirîna şirîn,
Rawesta melûl,
Meşa mexrûr,
Bêhna porê te yê bêhn-çiyayî;
Ango te..
Te Janda! ...

De were êdî, bes e! ...
Bes helîşkivîne vî dilî,
Bes kûr bike birînên min! ...
Kengî be ne dereng e;
Tenê hema tu were! ...

Janda! ...
Heyv,
Tîrêj,
Hewa,
Payîz,
Û tu! ...

Bêdengî,
Tenêti,
Xerîbî,
Hesret,
Û tu Janda! ...

Tu Janda! ...
Evîna min ya şermoke,
Kula min a delodîn! ...
Ew gotina biefsûn;
Ewa ji her tiştî bêtir min dixwest ji te re vegota,
Aniha, va ye diqêrînim
Û direşînim ser bêdengiya şevê:
'Ma tenegehîştî hêj? '
'Min tu divêyî Janda! '

2002-09-15 / Culemêrg

Ömer Dilsöz

Jivanî

dilên me yên şikestî,
bi tîna jivaniya biharekê
her riyân dipên.
lewma êdî çavan,
xewên şevan
li xwe herimandin.

debar li me bû nanoziko,
war bû navnîşaneke nediyar,
kolan bûne spartgeh,
bûne qada jivaniyê bo me...

bi hêviya jivanê;
li welatekî azad,
me berê xwe da çiyân
em bûne agir,
bûne ax,
bûne hewa,
bûne av
û me 'jiyan' ava kir.

em bûne dilop,
niqut bi niqut herikîn;
bi hedareke bêwest,
me nexwar,
venexwar;
têr nenivistîn,
nekenîn,
bi zikekê têr,
bi dehan mane birsî
da ku sibe xweş bibin
li vî welatî...

bi jivana warekî ava,
cîhaneke têr evîn,
welatekî azad,
jiyaneke birûmet;
me bend şikandin
demsal rakirin,
hevseng guhartin,
kozik kolan li şkeran,
çiya kirin bihuşt
û lê bi cih bûn.

bê west,
bê xew,
bi jivana dilên bijûn
me şikeft kolan,
tov lê reşand
û mirovahî tê de çand.

bi jivana wê rojê,

ew roja ku bihar dê vejî
em li ser piyan,
her hişyar in...

dê di wexta xwe de
xwe bigihînin jivanê

ji ber ku,
wê rojê,
li vî welatî dê şên û şeng be;
dê geş bibin hemû kulîlk,
bifûrin hemû rûbar,
bikenin hemû însan...

û
dê roj were hinda me;
tîrêj bide
û geş bike welatê me.

2003-07-16

Ömer Dilsöz

Nar Çiçeğim

Bir düşün görüyorum
ince bir hayalin koynunda
bir çocuk masumluğunda
ve bırakıyorum kendimini
o masum düşün kucağına

Oysa nasılsa bitmeyecek mi,
sadece bir düşün değil mi,
bir düşün ufku değil mi hislerim?

İşte böyle geçiyor zaman
ve büyüyor o düşün içimde
sende on düşün içinde
yalnızlığımla büyüyorsun

Düş büyüdükçe uzaklara bakarım
ta ufkun gökyüzüyle birleştiği
o kızılötesi çizgiye saplanır
hayallerimin o ince çizgisi

O zaman farkedirim yalnızlığı
ve hiçbir şey görmez olurum
aslında....
belki de sadece bir boşluğa bakarım
görmek için değil yani
yalnızca kendimden kaçmak için

Oysa hayallerimin son durağı sen
kızılötesi çizgide birleşir
ve o an içimde bir hıçkırık düğümlenir
ağlarım...
ağlarım sessizce,
kendimce,
bir başıma,
çaktırmadan erkekliğe inat!

Oysa görünce seni
her şeyi unutuyorum
masum bir çocuk gibi
hani en sevdiği oyuncağına kavuşunca var ya!
işte öyle bir heyecan doğar içime
o düşün bitme ihtimaline inat
yaşam sevinciyle dolup taşıyorum
aynen bir çocuk gibi
işte öyle seviyorum seni
seviyorum Nar Çiçeğim!

Ellerini tutmak,
alınına sıcacık bir öpücük kondurmak
ve doyarcasına boynuna sarılmak
ciğerlerime çekmek kokunu
hani yaz yağmuru yağına

kızgın toprak nasıl çekiyorsa
aynen öyle....

Sonra avazım çıktığı kadar bağırarak
bağırabilmek sana olan hislerimi
sevdiğimi söyleyebilmek
seviyorum seni yani;
seviyorum Nar Çiçeğim!

Geçiyor,
bitiyor,
yani tükeniyor zaman
neredeyse o düşün son anlarına geldik
birazdan her şey bitecek
irkilip,
açacağım gözlerimi
yani bir daha başa dönecek her şey
herşeyin başladığı 'o yalnızlık durağına'
ben yine yapayalnız
bir başıma kalacağım oracıkta
yağmurun altında
yüreği yaralı,
gözleri nemli,
yaşama dair hiç bir umudum kalmadan

Yine ufuklara dikeceğim bakışlarımı
o puslu,
o sisli,
o dumanlı havada
bir sefer bakmak için de değil
yalnızca şöyle bir göz gezdireceğim yani

Biliyor musun Nar Çiçeğim,
sana anlatamadığım
o gizemli sözcükleri
o binbeşyüz kelimeyi
o sıcacık hayalleri
bir emanet gibi
hep yüreğimde gizliyorum
belki bir gün gerçeğe dönüşür umuduyla
anenin muskası gibi,
yarin emaneti misali,
bir dua gibi hep saklıyorum onları

Kim bilebilir ki,
ufukların o kızılötesinde neller bekliyor bizi;
hangi umutlar,
hangi gerçekler,
hangi kavgalar,
kim bilebilir ki?

Yani içimdeki o şaşkın çocuk var ya,

hani seni görünce kendinden geçen,
hani titreyen,
kekeleyen,
çocuk gibi,
hani en sevdiği oyuncağına kavuşunca
heyecana bürünen...
işte o ben var ya,
görünce seni bir kıvılcım gibi saçılır,
ve o kıvılcım umuda çevirir
hayallerimin kırık rotasını! ...

Anlamadın mı,
yoksa anlatamadım mı?
öyleyse anlatayım;
Allah'ına kadar aşığım sana
aşığım ve biliyorum...
biliyorum verecek hiç birşeyim yok sana
şu sevgi dolu yüreğimden başka
yüreğimi ister misin Nar Çiçeğim? ! ...

26 08 2003/ Hakkari

Ömer Dilsöz

Neresinden tutulur ki yalnızlığın?

Deprem korkusu gibi
Hani gece yarısı ansızın çökünce üstüne
Bir telaş,
Bir çaresizlik,
Bir korku,
Ve bir kaçışma başlar sağa sola
Kaybolursun
Neye sarılacağını bilmezsin
İşte o zaman yalnızsın
Söyle bana,
Allah aşkına söyle,
"Neresinden tutulur ki yalnızlığın? "
Ateş gibidir o
Alev alev sarar seni
Yakar içten içe
Kemirir,
Eritir,
Küle dönüştürür,
Ve rüzgarlara savurur seni.

Ölüm gibidir yalnızlık
Neresinden tutulur ki ölümün
Bitişidir o her şeyin
Sonudur yani hayallerinin
Neresinden tutulur ki bitişin...?

Ansızın çöker üstüne
Bir çığ gibi
Ve kırar bellini
Şimdi söyle
Allah aşkına söyle,
"Neresinden tutulur ki yalnızlığın? "

Neyi anlatsam ki,
Nereden başlasam ki anlatmaya
Hangi yarayı,
Hangi yarayı deşsem ki?
Kime,
Kimlere,
Neler anlatsam ki,
Neresinden tutsam ki yalnızlığın?
Neresinden....

Bu öyle bir acı ki,
Hani yaşamda tutunacak dalın kalmadığında
Her şey...
Ama her şey tadını yitirdiğinde
Şeni yaşamdan biraz daha kopardığında
İnancını,
Yaşama sevincini,
İrsi bağlarını,
Dostluk hissini,

Aitlik duygusunu,
Yani özgüvenini,
Ve nihayet içindeki "o gizemli kendini" kaybettiğinde
Kime nereye gideceksin ki?
Neye tutunacaksın ki..
Söyle,
Allah aşkına söyle,
"Neresinden tutulur ki yalnızlığın? "

Kangren gibidir o
İçten içe kemirir,
Ve buluşır her damarına
Eritir içten farkına bile varmazsın
Elini versen ona
Yüreğini alır senden

.....
Anlıyor musun,
Anlayabiliyor musun?
Şimdi söyle,
Allah aşkına söyle,
"Neresinden tutulur ki yalnızlığın? "
Tutulmuyor ki...
Tutunmuyor ki yalnızlığa
Ateş gibidir o
Yakar seni içten içe
Farkına bile varmazsın....

2004-07-19

Ömer Dilsöz

Piştî Te

Piştî te,
Gotinên min miçiqîn,
Şohbetan tama xwe winda kir.
Êdî ez nema çûm ber awênayê,
Nema kenî nava çavên min
Êdî min kelecana jî bîr kir.
Xweşî jî dest da,
Bêdengiyeye mirinî kete ser min.

Êdî min dilê xwe jêvekir
Avêt ber derî
Lanet bi qederê kir
Bi her du çavan kire girî

Ez bûm serhildêrek hesthar
Min her tişt şikand,
Ji hev xist
Û bê serûber kir.

Piştî te,
Kaniya hestên min ziwa bû
Pênûsa min şikest,
Dilê min herişî
Xewnên min li nav hev ketin
Xeyalên min koç kir
Xweziyên min çilmisîn
Ez req bûm,
Hişk bûm.

Û min dilê xwe jêvekir
Avêt ber derî
Da ku herkes pêpes bike!
Ma dilekî bê te min jî bo çi ye? !

Min lanet li wê rojê kir;
Roja ku tu çûyî...
Na na!
Roja ku ez hatime dinyayê
Min nifir reşandin
Qerb vereşand
Û dijûn li xwe barandin.

Piştî te,
Çûçikên dilê min firiyar
Pêlên dargulê weriyar
Di nava min de
Valahiyeke bêbinî despêkir
Ez tirsiyam
bo halê xwe
min kire girî

Ez mame bi tenê;

Bi tena serê xwe
Bê hevî,
Bê evîn,
Bê xwezî...

Û min dilê xwe jêvekir
Avêt ber derî
Da ku ez te ranebihîzim
Jana te seh nekim
di nava dilê xwe de.

Wekî zarokê ji şîrî vekirî
Na na,
Wekî berxikê bismêkkirî
Bi dû serê xwe
Li der û kolanan ketim
Ji tiştî,
Ji her kesê
Min tu pirs kirî

Lewma piştî te
Min dilê xwe jêvekir
Avête ser çopdankan
Û ber sêdara çavên te
Min dilê xwe li dar vekir

2003-09-17 /Culemêrg

Ömer Dilsöz

Revaneya Evînê

Min diviya hez bikim
Te nediviya
Lê min hez nedikir
Te ji nû diviya
-te hez dikir

Min bawer nedikir
Tu li rêyan digeriya
Min bawer dikir
Tu ji rêyan vedigeriya

Min diviya te bibînim
Tu direviya
Min diviya te nebînim
Tu li min digeriya

Tirs li te peyda dibûn
Te ji min dipirsiya
Kul li te peyda dibûn
Te ji min dipirsiya

Te ji jiyane hez dikir
Tu ji min digeriya
Jiyane bêbextî li te dikir
Tu li min digeriya

Ne te ji min hez kir
Ne ji min geriya
Ne te dilê min geş kir
Ne jî ji min veqetiyayî

Niha tu li aliyekê bêdeng
Ez li aliyekê
Lê em herdu ditirsîn
Hem ji xwe
-hem ji felekê.

2004-07-31

Ömer Dilsöz

Sende ne arıyorum?

bilmem sende ne arıyorum,
neden gözlerinde kayboluyorum,
sende kendimi mi arıyorum,
yoksa seni mi kendimde arıyorum?

bilmiyorum...
bilemiyorum
ama sensiz de edemiyorum
yapamıyorum...

bilmem sende ne buluyorum,
neden sensizliğe katlanamıyorum,
yoksa sende özgürleşiyor muyum,
ya da sevgiyi sende mi buluyorum?

anlamıyorum...
anlayamıyorum
ama sensiz de bitiyorum
seni özlüyorum.

2004/ Diyarbakır

Ömer Dilsöz

Seni Ele Verir Aynalar!

Of aynalar of!
Yıllardan sonra
Seni ele verir aynalar
Yüzündeki o derin hatlar
Ve yılların yorgunluğunu anlatan o çukurlar
Seni ele verir...
O zaman içinden kayar derin bir "of"
Ve kendi kendine söylene durursun;
"aslında her şey farklı olabilirdi"
"farklı yaşayabilirdim" diye...
ama seni ele verir aynalar.

Of aynalar of!
Yıllardan sonra
Seni ele verir aynalar
Saçındaki şu aklar
Yüreğin yorgun, titrer ayaklar
Yaşamda tükenince heyecanlar
Seni ele verir aynalar
Ve ardına baktığında;
Geride bırakılmış sadece yürekteki yaralar
Ve hala içinde kaynayan yapamadıkların
Ve ömrünün yetmediği planlar...
O zaman içinden geçer;
Ve kendi kendine mırıldanırsın;
"aslında her şey farklı olabilirdi"
"ben farklı yaşayabilirdim" diye...
ama seni ele verir aynalar!

Of aynalar of!
Seni ele verir aynalar...
İçinde kanar
Yüreğindeki şu derin yaralar
Yetişemediğin şu zaman fırtınası
Akar gözpınarlarından
Her damlasında bir acı gizli,
Bir yara kanar...
Ama seni ele verir aynalar.
Gözlerinin içi artık gülmez
Ve yorgun yorgun bakarsın bir boşluğa
Anlam veremediğin şu yaşamın ardından
İşte o zaman
Seni ele verir aynalar;
Ve ansızın dilinden dökülür bir-iki satır;
"aslında her şey farklı olabilirdi"
"ben farklı yaşayabilirdim" diye...
ama seni ele verir aynalar.

Of aynalar of!
Bir ömrün ardından
Seni ele verir aynalar
Kamburlaşan omuzların

Ve yere hafifçe deyen Őu titrek ayakların
İçindeki umutsuzluęun,
Yaşayamadığın yaşamının itirafçısı olur
Yere bakan yorgun gözlerin
Kaybettiğin sevdanın habercisi olur
Ve yalnızlık
Soęuk bir nefes gibi hep seni bulur
İçinde gezer;
Uykularını böler
Ve seni ele verir aynalar
İşte o zaman;
Gözlerinden akar iki soęuk damla,
Yapamadıklarını anımsatırcasına
İşte o zaman;
Dilinden sökölür iki cümle,
"aslında her Őey farklı olabilirdi"
"ben farklı yaşayabilirdim" diye...
ama seni ele verir aynalar.

2004-05-10

Ömer Dilsöz

Sermestim

Sermest û dînim,
neçe yarê,
min nehêle dilbirînim;
aaax dilbirînim! ...

Sermest û harim,
neçe yarê,
min nehêle birîndarim;
aaax birîndarim!

Sermest û gêjim,
neçe yarê,
min nehêle dil biêşim;
aaax dil biêşim! ...

2003-10-28/ Culemêrg

Ömer Dilsöz

Sosinê

Lê Sosinê, malxirabê tu çi dikî li çiyayên Gûzereşa malxirab, hin melûl û stûxwarî, lê Sosinê! ...
Ka were bêhna xwe ya xweş berde nava van hinavên min ên şewitî û min bibe zozanên Gare, Sermedar û Geraşîn e. Lê Sosinê! ...
Lê malxirabê! Tu min zozana Berçelan û Feraşînê bike mêvanê kewên ribat ku Ligel tafdana spêdeyan pirî xweş dixwîne.
Na na, ne weleh tu min bibe ser wan kaniyên sar û xweş, li terazinên dora keviyan dane;
Bila bilbilê malixirab bêt û strana 'xunava gulê' ji bo dilê me yê kovandar û xwerûjan velorîne...
Hey Sosina minê, Sosê!
Hey Sosinê! Da nebêjin ev gelê han bê xwedî ye, kesê xwe nîne! ...
Serê vê salê, danê vê biharê evdala Xudê ev revendê malxirab bi rêketine,
Ka bo min bibêje; ewê biçin zozanan, an fermana Roma reş a xayîn li ser dagirtine...

Lê Sosinê, davziravê; tuyê wan davên xwe didî ber bayê sira sihara vî welatî, radimûsî tîrêjên roja nû ye
Malxirabê, tuyê were bo dilê min ê birîndar bibe nûja jînê, kulan li ser dilê min hilavêtî ye,
Roja xweş li ser min ava bûye;
Feleka me li me wergerî ye,
Riya me çol û kûstanin, kolanên xelkê biyanî ye,
Danê vê biharê xweşiya dinyayê li ber dilê me 'Evdala Xudê' herimî ye...
Hey Sosina minê, bextê te me; tu dav bi dav xemla xwe ya xweşik berde ser welatê me yê talan bûye,
Xudê pê dizane sala îsal, danê vê biharê emê berê xwe bidin welatê xerîb û xurbetan,
Kî dizane emê li çolan bibin xwerekê dirindan,
Teyr û tilûr dê me hincirînin li ber nik û pancan,
An jî hemû dê ji ta û bîrsê, tazî bêfathe bimirin li ber cergê tavê, li serê vê bihara xwedê!
Ma tu nabînî malxirabê eve fermana serê me rabûye!
Lê Sosina minê Sozê! ...

05-06-1995 /Gûzereş

Ömer Dilsöz

Strana Evînê

Strana evîna min;
Ji dengekî kelegirî,
Çend peyvên zîz,
Wekî dilopa ava keviyan
Zelal,
Lê tijî merem...
Dû hev,
Bişid û herîkbar
Ji nava nefeseke westiyayî;
Di kuna bilûra bilûrvanekî re;
Dû hev rêz dibin;
Rêz dibin çend gotinên sotî,
Bi kela dilekî bihujî,
Û hişîmend...

Ji dengekî xeyîdok;
Bi awazeke xwerû-gazinc
Pey hev,
Kom dibin çend gotin,
Û ref bi ref tîn ser zimên.

Ji gewriyeke tî û zuha,
Bi daxwaza şerbikekî ava zelal;
Ya wekî şîrî spî,
Sar û qerimî.
Wekî dewê rex rûbarî
Yê sibitkirî
Ji destê xweşdiviyê;
Tevî ava avzemên çiya,
Lîlava ber keviya...
Qurt bi qurt daqultînin;
Çend biwêjên tertijî,
Bi ser hinavên kelijî re
...

Hingê;
Bayê xeyalên min diçe,
Digere li deverên veşartî;
Li gundekî xweş,
Li nav çar çiya,
Di newaleke kûr de rûniştî.
Û aveke sar,
Bayekî hûnik,
Xwezayeke paqij
Di nav hev de...

Ji dengekî westiyayî;
Hin gotinên bêhn xwêdangirtî,
Digel awazeke cotkar û rênçber
Tevî du eyhotkên pale
Û nefeseke têraxînk...
Dû hev,

Hûnandî,
Lihevhatî,
Xweşik û fesîh,
Zelaî û vekirî
Rêz dibin û tèn ser zimên.

Wekî stranekê,
Strana evînekê,
Evîna mirovekê,
Mirovê welatekê...
Di dileke kesertijî de
Çend xwezî,
Wekî kulmeke agir,
Nexêr, xwelîmora dil,
Heye ku bizoteke gur
Ji nava rêzikên rêsayî,
Li ser tevnê hinavan
Di nava kovanan de
Tên raçandin û der birîn;
Ji gewriyeke tal û tî...

Bayê xeyalên min diçe;
Digere,
Vedinêre dinyayê.
Li nivê şeveke daçûyî,
Piştî hingorê razanê,
Di xewneke hilçûyî de
Ji dengê têla tembûrvanekî şareza,
Çend dilopên gotinan
Yên jibîrbûyî,
Mîna xiltê sorikê hildidin;
Di nav bîrhatinên kevin de
Pir dijwar...
Dû êk,
Mil bi mil,
Bi perwer,
Çav-vekirî
Tên serdana guhçikê dilê min;
Û ji nişka
Mîna jehra dûvpişka
Lê digezin...

Hingê,
Deng...
Dengê dil...
Dengê Janan
Lêdana rajenê bi têrguman,
Û hesteke di navbera tirs û kêfê de
Yanî kelecane...
Kelecane vedigire min.
Vêca, diherikin ji kûrahiyan,
Dû hev,

Rêz bi rêz,
Çend dilopên zelal,
Çerm û sûr tèn ser hinarîkên rûyan;
Û li hevokan dibe zêmar...

Hingê,
Ew stran,
Ştrana ji harmoniya dengan
Û pêjnên têvel afirî
Diherike ser ziman:
Xwerû gazind,
Têr merem,
Tijî keser,
Bes mişt hevî...
Rêz bi rêz;
Dû êk,
Pişt êk,
Neql bi neql,
Vehûnandî,
Rêsandî,
Û weribandî...

.....
Dilop bi dilop diherikin
Tên li ser ziman dipengizin
Û di navbera çav û birûyan de;
Ji xeleka strana evîneke dilsoj tèn pê
Û dibin helqek ji strana evîna min.

2002-10-17 /Gûzereş

Ömer Dilsöz

Şilêr

şilêr,
tu ji bo çî serê xwe nixwîn dikî
qey tu digrî şilêr...
qey tu birîndarî,
an evîndar...?

bibêje şilêr
ji bo çî stûyê te daketiye
li pala te şikêr
beramberî te belekî ye
te çî ye şilêr
ji bo çî rûyê te şil bûye
ji bo çî şilêr
derdê te çî ye...?

şilêr
piştî ku min tu dîtî
ez bi rojekê hezar salan jiyam
hezar caran mirim
piştî her mirinekê bi rondikên te
hezar caran vejîyam
hezar caran şilêr...

şilêr
êvar e li çîyan
ewran xwe daye ber rojê
ji kûratiya newalan
deng vedide dengê dengbêjekî
sîber daketine xwarê
teyr difirin ber bi asîmanan

tu nabînî
lê nanihêrî şilêr
qey tu xeyidî ji me
qey tu dilmayî şilêr

tu ji bo çî sernexwînî şilêr
ka bibêje te şerma kê bar kiriye
te raza kê pişt kiriye
te dilê kê veşartîye
te xwîna kê hewandiye
tu zêmara kê dikî
şîna kîjan terotolî digerînî
te dengê xwe li ku berze kiriye
di nalîna kîjan dayîkê de
di awaza kîjan dengbêjî de
di girîna kîjan zarokî de

tu şerma kê dikî şilêr
kê....?

şilêr

hezar dilên min te ji min dizîn
hezar caran te ez çal kirim
li nava axê
li beyareke çiya
li bereheke şikêran
di nava xwîdana şermê de
gotinên min li ser zimanê min hişk bûn

şilêr
guhdariya çîroka min bike
ez ji bo te dibêjim ha,
hezar gotinên xwe yên zîz
yên di sîtavka spêdeyekê de
li ber bayê felekê baligî ne
ez li nava xunava te dihêwirim
riyên min girtî ne
evîna min ji min dizî ne
dizî ne şilêr...
de serê xwe rake şilêr
li nav çavên min bimêzîne

şilêr
ji axa tu li ser şînhatî
pêjnên têvel tîn ber guhê min
nalîn,
qêrîn,
qîjîn,
gazî
hemû pêkve olan didin
ev çî ye şilêr
qey tu li wan dengan dinêrî
ew dengên li pêş çavên te
di sînga axê de çal kirine
qey tu jî şahidê wan rojan î
wan....
rojan...
şilêr...

şilêr
ji ser rûyê te xwîn diniquete
xwîn û av
tîna janekê kel vedide
kel û jan
rondik têne xwarê
kel û girîn

lê şilêr
min gelekî mereq kiriye
ka kena te çawaye
bişîrîneke sivik dê çend li te bê
ez nizamim şilêr
ez ninazim çî û çî ne razên te

xemên te,
keyfên te,
henekên te...?

tu cîhaneke cudayî şilêr
di rojekê de hezar salan dijî
di şevê de hezar tofanan radikî
di mistekê de deryayan
oqyanûsan dihewînî şilêr

şilêr
êvar e, şev sar dibe
her kes diçe
xwe dispêre hêlîna xwe
berxik vedigerin ber makê
teyr xwe dadidin ser lîsên xwe
mirov dinişin nav şaristaniyê
masî xwe davêjin nav pêlan
kêzik bi axê şa dibin

.....
û ez û tu şilêr
em bi tenê dimînin
li qontara çiyayeke jibîrbûyî
li nav rûpelên dîroka nezayî
li ser axeke nekêlayî
xav,
xwas,
û damayî

şilêr
êdî tu dikarî serê xwe rakî
ji bilî min kes nemaye li vir
qey tu xwe ji min jî vedîşêrî
na şilêr na,
jixwe em jî rayên hev dertên
ji dilê axê
ji kopê hêviyan şilêr!

2003-12-26/ Amed

Ömer Dilsöz

Tenê me

Dilê min dinale,
bêhal im.
xwîn dikeve ser kezebê,
diqehir im,
naxêr, xwerû qehr im!

Di bêdengiya şevê de
dicemid im,
direcif im,
sebra min nema tê,
xewn bo min tal in
şev meh in;
naxêr, wekî sal in.

Ango ez bi tenê me,
dilkovan im,
çaverêyî te me,
bê xudan im.
naxêr, bê te nikarim!

Di nepenîtiya awirên te de,
razzan im,
li ser deryaya evîna te
keştîvan im,
melevan im,
naxêr, çav-giryan im!

Qet nizamim ez xwe bêyî te;
hêr û gêj nav jiyana im,
dajon min tirsên bê wate
dinalim,
birîndar im,
naxêr, evîndar im!

05-12-2001

Ömer Dilsöz

Vebêjim

Divê ez vebêjim;
Hemû xewnên xwe
Ji bayê spêdeyan re
Kîte bi kîte...

Divê ez rave bikim;
Hemû çîrokên xwe
Ji rûbarên geliyan re
Tîp bi tîp...

Digel sîtavkên berêvarî
Li ser sînga çiyayên bilind
Li dora agirekê;
Bi qirçîna sotina bizotan re
Heko dilore lûliya çaydanka reş
Di bin çilvilîna stêran de

Rojekê...
Rojeke biharê,
Şevêkê...
Şeveke havînê,
Li welatekê...
Welatê Rojê;
Divê ez vebêjim
Hemû stranên xwe
Ji evîndaran re
Rêzik bi rêzik...

21-03-2003

Ömer Dilsöz

Yaşam

Bazen bir yıldız kadar uzak,
Bazen bir tebessüm kadar sıcak

Bazen bir kurşun kadar öfkeli,
Bazen bir türkü kadar hüzünlü

Bazen bir şiir kadar hicranlı,
Bazen de ecel kadar kararlı

Bazen bir sevda kadar dopdolu,
Bazen bir ayrılık kadar kupkuru

Bazen bir yalan kadar aldatıcı,
Bazen bir gerçek kadar yapıcı

Bazen bir umut kıvılcımıdır yaşam
Bazen de zehir gibidir, sanki zindan

Bazen senin kadar güzel,
Bazen de ölüm kadar acıdır hayat! ...

2003-08-05/ Hakkari

Ömer Dilsöz